



Li Tirkîyeyê kes naxwaze leşkeriyê bike. Hejmara qaçaxên leşkeriyê gihîştîyê 250 hezaran

## Artêşa Tirk çav berda xwendekaran

**A**rtêşa Tirk ji alîkî ve berê xwe dide mirovên Kurd yên sîvîl; wan dîkuje, bi awayekî vekirî proveyên qirkirinan dike, li aliyê din, ji gelê Tirk fedekariyên nû dixwaze, barê li ser milê wan giran dike û dixwaze wan bike hevparê şerê qirêjî, kesên ve napejirînin jî bi hin azîneyan tîn cezakirin.

**E**vqas zilm û pêkûtiya polîsan, tengasiyên aborî ku li dû polîtîkayên perwerdekariya bipere hatin, sergêjiya naveroka perwerdeya zanîstgehên YÖK'ê tîrî nekir, îcar rê bi giştî li ber wan tî girtin û dewlet di gel tîrsa ji dibistanê avîtinê, tîrsa bûyîna navgînê şerê qirêjî û mirinê dixwe dilê xwendekaran.

**P**êşt, ji bo çareserkirina pêdiviya leşkeran, hizra leşkerên pîspor avête holê, lê tevî giş bertîl û hewldanan negihîşt encameke erênî. Li gorî îstatîstîkên fermî, di sala 1992'yan de cihê ku di nav refên artêşê de ji bo leşkerên pîspor hatibû veqetandin, (23.745 kes) tije nebû. Piştî ve bi reklameke mezin avabûna artêşa taybetî îlan kirin. **Rûpel 8**



## Zilma Fransa li ser Kurdan

**Navenda Nûçeyan-** Piştî polisên Alman, vî carê jî yên Fransî bi ser Kurdên penaber ve girtin, malên wan tevîhev kirin û gelek kes ji wan xistin bin çav. Roja 18'ê meha Mijdarê polisên Fransî bi awayekî hovane bi ser sazî û malên Kurdên ku li Fransayê dijîn ve girtin û bi sîcdariya terorê zêdeyî sed kes ji wan xistin bin çav.

Li gor nûçevanên me yên Parîs, Roja pêncşemê serê sibehê saet li dora 6'an bi sedan polisên Fransî bi hevkarîya MÎT'a Tirkîyeyê bi hinceta lêgerînê bi awayekî hovane bi ser mal û sazîyên Kurdan ve girtin. Di dema van lêgerînan de bi dar û jopan, çî hate ber wan şikandin û zêdeyî sed kesên jî bi sîcdariya terorê bi xwe re birin. Bi vî awayî jî

xeynî êrîşbirina ser sazîyên Kurd yên çandî û hunerî, bi sedan malên Kurdan jî di bin lêgerîna polisên Fransî re derbas bûn. Di van lêgerînan de tiştekî pîrr balkêş hin pîrs di mejiyan de çêdikirin. Polîsan çawa hemû malên Kurdan yên li taxên cihê, tesbîtîkiribûn û jî nişka ve digirtin bi ser wan ve? Fransa ya ku heta vîga behsa mafên mirovan û azadiya gelên bindest dikir, çawa çêdibû ku ji nişka ve ewçend xwe dijwar dikir û bi ser Kurdên ku ji ber pesta dewletên dagirker li welatên wan cih bûbûn ve digirtin. Li gor derdor û pîsporên siyasî, ev tewîr guherîna Fransayê bi du sebeban ve tî girêdan. Yek jê faşîstbûna wezîrê Karê Hundirîn yê Fransayê ye.


**Dûmahîk Rûpel 9**

## Kemal Bîlget winda ye

**Navenda Nûçeyan-** Ji Cîgirê Serokê Giştî yê DEP'ê Kemal Bîlget ji 15'ê Mijdarê bi vir ve tu agahî nayê hildan. Li gorî daxuyaniya nivîskî ya Sekreterê Giştî yê DEP'ê Îbrahîm Aksoy, Bîlget di 15'ê mehê de ji aliyê polisên ku girêdahiyê Liqa Yekemîn a Emniyeta Enqerê ne hatiye girtin.

Aksoy dadixuyîne ku rayedarên Emniyeta Enqerê gotine ku, Kemal Bîlget şandine Stenbolê, lê ta niha der mafê wî de tu hay û agahî bi dest nexistîne.

Sekreterê Giştî Aksoy vî bûyerê bi daxuyaniyên Serokwe-



zîr Tansû Çiller ve girê dide ku wan wek hedef dabû nişan û wê jî windabûna Kemal Bîlget berpirsiyar dibîne û diyar dike ku ji jiyana wî bi endîşe ne.

### DI VÊ HEJMARÊ DE

**Rêberiya Mezopotamyayê**

Mizgîn Sîpan/ **Rûpel 6**

**Lênêrînek bi lez li ser rojhilatê**

**Kurdistanê**

Anîs/ **Rûpel 16**

**Lîcê û bêdengiya nivîskarên Kurd**

Dilbixwîn/ **Rûpel 3**

**Ku mirim kesera min bixemilînin**

M. Zahîr Kayan/ **Rûpel 11**

## DED'ê biryara radana Gündem'ê da

**Navenda Nûçeyan-** Dadgeha Ewlekariya Dewletê ya Stenbolê ya bi Nimroya Duduyan (DED-Stenbol No 2) biryara girtina rojnameya Özgür Gündemê ji bo 15 rojan da. DED (DGM) di danîşîna xwe ya 18'ê Mijdarê de bîyî daxwaziya dozger ev biryar wergirt. DED'a Stenbolê, ji ber hevpeyvîna bi

Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan re ya bi navê "Li ser çepa Tirkîyeyê û yekîtiyê" ku di 2 û 3'yê Gulanê de hatibûn weşandin û ya nivîskarê rojnameyê A.Kadîr Konuk a bi navê "Platforma piştigiriyê" biryara ji bo 15 rojan girtina rojnameyê, ji bo xwedîyê wê Yaşar Kaya 124 milyon cezayê pere û ji bo

Berpirsiyarê Nivîsaran ê kevin Ş. Davut Karadağ jî 41 milyon cezayê pere û 5 meh jî cezayê hepsê da. Abûqatê rojnameyê Osman Ergîn daxuyand ku biryarên hatine dayîn bi pêşdarazî û bi qestî ne. Heke biryara radana rojnameyê ya ji bo 15 rojan jî aliyê dadgeha bilind ve ji bî peji-randin, dê ev ceza pêk were.



# Paşmayên şehîdan

Rojekê ji van rojan  
Zarokekî pirr ciwan  
Pirr damayî û perîşan  
Got: "xalo ez bêwar im

Min ne cih e, ne war e  
min ne hal e, ne kar e  
Ez yê mayî bêçare  
Derbeder û hejar im."

Got: "Birakên me ji bîrsê  
Digrîn kes lê napîrsê  
Bêxwedî ne em her sê  
Lew bi gazî û hewar in."

Got: "Xalo bi xêra xwe kî  
Belkî xêrekê bi min kî  
dergehêkê li min vekî  
Ev ro bêkes û jar im

Min hizrek bêrik, înat  
Ser zarokê terh û kat  
Bû dinya lê bû mîrat  
Dibêjît ez bêzar im?"

Min jê pîrsî: "Tu kî yî  
Tu kurê kîj babî yî  
Bo çi wisa bêcih î  
Vê qehra te ez xwarim?"

Vêca girî û gote min:  
Yên bêkes û jar em in  
Şehîd bûye bavê min  
Ser maf û xak û war im."

Got: "Kurê şehîdî me  
Bêdêwbav û xwedî me  
Digerim bîfedî me  
Helk çûm bêhedar im

Em zarokên şehîdan  
Em ên mane bê xwedan  
Hesret in bo pariyek nan  
Lew bêjîn û jiyan im."

Got: "Kes li me napirse  
Kes ji kesî natirse  
Xwîn ji qehrê d'qerise  
Ji vê çendê dilsar im

Ez bi hawar û gazî  
Pêxwas, birçî û tazî  
Digerim li vî sazî  
Li nav gund û bajar im

Bêlome ye gera min  
Nizanin bi egera min  
Jan kete ku dera min  
Xwîn qerisî l'damar im."

Got: "Ne ez bes sed hezar

wek min hene jînehar  
Tengezar in bêhedar  
Ne bi tenê giriftar im."

Got min xalê rihdirêj  
Karbîdestên şaş û gêj  
Armanca wan bî qirêj  
Lew ev ger e bû kar im

Ger wan aş baş bigêra  
Nekirban dest bi xêra  
Me ev gotin nedihêra  
Bawer ke yê navdar im

Nanê zîkê hejaran  
Kete destê zordaran  
Dan devê koremaran  
Sewiyê berdiwar im

Dîsa min gote delal  
Zarokê şeng û şepal  
Rojek dê bî xwedî mal  
Qet nabêjî bêbar im

Zarokî qîjek rijand  
stûna azadiyê hejand  
Got: "Te dilê min pijand  
Ne bîeql û didar im

Ew xayînen doh û pêr  
Li gel faşiyên bîxêr  
Li ser me d'xwarin wek şêr  
Li ber wan nobedar im

Hevalên faşîya bûn  
Rêberên Besiya bûn  
Daîm li ser rîyan bûn  
Ez biwan agahdar im

Ew dihatin şerê me  
Dikuştin bapîrên me  
Ew bûn bela serê me  
Rêgir bûn ser rêbar im

Ketin malên gundiyan  
Dexl û danê sêwîyan  
Bo xwe dibirin pê diyan  
Ev bû karê xwînxwaran

Gel rejîma faşîyan  
Ew diçûn serê rîyan  
Agir berdan xaniyan  
Li şîrwar û kevnewar im

Xaniyek ava nehêlan  
Kaniyek nema neşêlan  
Zevyek nema nekêlan  
Ya paşa û xwînxkar im

Daîm darê wan dijênî  
Çermê laşê me dirênî

Hêş me digot wan ezbenî  
Tu yî rêber û serbar im

Doh bûn ew koledar  
Xwîna pêşmerge vedixwar  
Niha bûne dost û yar  
Dibêjin tobedar im

Van teresên teresbab  
Bêguneh û bêesbab  
Sedhezar yar û ehbab  
Dan kuştin bi dest neyar im

Ev rokê jî her ew in  
Xwedan lehb û derew in  
Behra me dixwin nahewin  
Nabin helgirê bar im

Niha jî li ser derincê  
pişkdar in li bîrcê  
Xwedanên wê îşkencê  
Qet nabin dost û yar im

Niha bûn serkarên me  
Ket dest wan şîrwarê me  
Şeş bês lêdan parên me  
Lew jar, tar û mar im

Hindek hene çi nezan  
Ketne rex milê dizan  
Xwe dikene partîzan  
ber çavên kes û yar im

Serdev mîrxas û mîr in  
dildirêj in bîxêr in  
belê tîra xwe fêr in  
Ger nebêjim nikarim

Ev çîye hat serê me  
Ji dest pat û xwerê me  
Yê rûniştî li berê me  
Dibêjin: "Em serdar in."

Ên hevalbendên Sedam  
Îro tev bûne endam  
Tev de bûn şîyar û dam  
Dibên dam û siwar im

Ev çi yasa pêxwas e  
Yasa we kêr û kas e  
Kure ye kes nenas  
Faşîst e li vî biryar im

Gelek rêberên dilsoz  
Ên xwedan armanç û doz  
mane heyî li ser aloz  
Derbarey vî pîrsiyar im

Muhammed Jar/Zaxo

## Welat, çavê gelê me

Silavên germ ji dilê xwe yî germ ji were rê di-  
kim.

Gelî hevalan: ji welatê xerîbiyê, welatê bîke-  
siyê, tim dixwazim pêşketin ji we re û ji xebata  
we re ku ji bo gelê me û welatê me ye.

"Welat" çavê gelê me. "Welat", ziman û  
devê gelê me ye.

Di "Welat" de rewşa Kurd û Kurdistan tê xu-  
yakirin. Pêşketina "Welat" pêşketina şoreşa a-  
zadî û sîrxwebûna Kurdistanê ye.

Ji bo "Welat" her dem pêş ve here, divê kar  
û xebata me, ji her demî xurttir be û divê  
"Welat" bigihêje tevî gelê Kurd. Kesê bi Kurdî  
nizanibe bixwîne, divê em alîkariyê pê re bikin  
û xwendinê hinî wî bikin.

Bi xwe ez, ji Kurdên Tirkîyeyê me û li Ukray-  
na dixwînim. Li vî bajarî (dewletê), ji xeynî min  
Kurd najîn û ev yek jî, bi rastî gelek zor e.

Berî niha min gelek hejmarên "Welat" li ba-  
jarên dinê xwendine. Bes, li bajarê ku ez tê de  
me "Welat" nagihêje min. Wek min got, ji ber  
ku ez tenê Kurd im û "Welat" ji nayê vir, jiyan,  
zehf zor e.

Ji bo vê yekê, ji kerema xwe re, heger hûn

karibin ji min re her hejmara nû derket bişî-  
nin, ezê zehf kêfxweş bibim. Gelî hevalên heja  
ji we re ji niha ve spas dikim.

Kendal

### Fiyeta Welat guherî

Ji ber zêdebûna fiyeta  
kaxez, çapkirin û pêdiviyên  
din, ji bêmecalî me jî  
buhayê Welat kir 10.000.

Em bawer in ku xwende-  
vanên me vî biryara me wê  
di cih de bibînin.

Rojnameya Welat

## Nivîsara Welat

### Rojnameyeke neteweyî

Xebatên me yên ber bi afirandina rojnameyeke  
neteweyî û nûjen ve bêrawestî didomin. Ji bo  
nûkirina Welat projeya ku me daniye ber xwe, bi  
mîjar û xalên xwe ve bi giştî ev in.

1. Kadroya Welat
2. Form û mîzanpaja Welat
3. Naveroka Welat

#### KADROYA WELAT

a) Zêdekirina xebatkarên li navenda Welat. Ji niha  
ve hejmara xebatkarên li navendê gihîştine deh ke-  
san. Hedefa me ew e ku em ji her bajar û herêmên  
Kurdistanê û ji welatên ku Kurd ji berê ve lê dijîn, ke-  
sekî ku ji vî warî fêr dike, di navendê de bi cih bikin.

b) Zêdekirina nûçevanên li Kurdistanê, li Tirkîyeyê  
û li welatên din. Li hemû bajarên Kurdistanê, li hin ba-  
jarên Tirkîyeyê, Ewropa û li welatên Sovyeta berê,  
divê nûçevanên Welat hebin. Heta niha me nêzîkî  
deh nûçevan li wan deveran (ji xeynî yên li Ewropayê)  
bi cih kirine.

c) Ev nûçevanên ku ne di navendê de ne, divê ye-  
ko yeko an jî dudo dudo bîr navendê, çend hefteyan  
bimînin da ku baş bîr gihîştandin di warê zimên û roj-  
namegeriyê de. Bi vî awayî di nav şeş meh an jî sa-  
lekê de wê Welat bibe xwedî kadroyeke pirr xurt.

d) Ev kadro wê ne tenê nûçevaniyê bikin; her wiha  
wê rojnameyê belav bikin, bidin belavkirin, xwendin,  
naskirin, aboneyan jê re bibînin û hwd.

#### FORM Û MÎZANPAJA WELAT

- a) Wê logo bîr guhertin û hinek mezintir bibe.
- b) Hejmara rûpelan wê bibe 24
- c) Formata wê mîna xwe bimîne
- d) Çar an jî heşt rûpelên Welat wê rengîn bibin.  
(Rûpelên 1,2,11,12,13,14, 23 û 24.)
- e) Wê bi kaxezekî din ê bi kalîte Welat bîr çapkirin.
- f) Forma nivîsê quncikên wê bîr guhertin û ne li  
ser navê yek şexsekî tenê bin. Di şûna quncikên niha  
heyî de, (ji xeynî Nivîsara Welat û Rojeya welat) wê  
sê quncikên din hebin û di wan de kesên di warê xwe  
de pispor wê bi dor binivîsin.
- h) Wê nûçe kurttir û pûnto girtir bibin.
- j) Di her hejmarî de bi nêzîkî wê du nivîs derneke-  
vin

#### NAVEROKA WELAT

a) Bi taybetî nivîsên der heqê bûyerên ku li Kurdis-  
tanê diqewimin de, bi giştî jî bûyerên girîng ên we-  
latên din, wê bi destê nûçevanên me yên ne li na-  
vendê bîr amadekirin.

b) Nûçeyên aktuel û balkêş jî wê hebin.

c) Nûçe û gotar û lêkolînên der barê çand, zimên,  
wêje û hunerê de wê ji berê zêdetir bin.

d) Ji xeynî hin nûçeyên girîng ên ajansan ku ji mec-  
bûrî tîr bikaranîn, wê nûçeyên Welat orijînal û xwe-  
ser bin

e) Nivîsên bi Soranî û Dimilî wê bi rêkûpêk bîr we-  
şandin. Car caran nivîsên Goranî jî wê bîr weşan-  
din. Ji bo pêşvebirin û yekîtiya zimanê Kurdî, em vî  
pêwîst dibînin

f) Rûpelek ji bo danasîna pirtûkan wê bîr amadeki-  
rin.

g) Di Welat de ji bo sporê jî wê rûpelek cih bigire.  
Dibe ku ev rûpel ji we re balkêş û komîk were, lê bi  
rastî em wê pêwîst dibînin. Helbet, nûçeyên me yên  
sporê, ji yên rojnameyên din wê pirr cihêrengtir bin. Bi  
vî awayî, hem bala Kurdên ku ji aliyê mejiyê xwe ve bi  
sporê ve zêde hatine girêdan wê bîr kişandin û nêrîna  
wan a li ser sporê ya apolîtîk bîr guherandin, hem jî  
zimanekî sporê wê bîr çêkirin û bi pêş ve birin. Pêdivî  
ye ku zimanê Kurdî di her warî de bîr xurtkirin.

h) Li ser bûyer û pêşveçûnên zanistî jî di rûpelekî  
Welat de wê nûçe û gotar cih bigirin.

24 rûpelên ku em ji bo Rojnameya Welat difikirin  
ev in:

1-Berg 2- Nameyên xwendevanan 3- Aktualîte 4-  
Jîna civakî 5- û 6- Nûçe 7- Neqûşk 8- Soranî 9- Di-  
milî 10- û 11- Nûçeyên Derve 12- û 13- Rojev 14-  
Lêkolîn û lêgerîn 15- Çand û Huner 16- Ziman û  
Wêje 17- Berhem 18- Dîrok 19- Poetika 20- We-  
şanên nû 21- Spor 22- Nameyên Xwendevanan, Xa-  
çepîrs, Qerta abonetiye 23- Rûpelê Zarokan



## .....NÛÇEYÊN CENGÊ.....

## Her derê Kurdistanê dikele

**Navenda Nûçeyan-** Artêşa Tirk li hember PKK'ê şerekî qirêj didomîne, bi firoke û balefiran ve çiya û zozanan dide ber bombeyan, her derî diqelîne; lê serfiraz nabe. Gerîlayên ARGK'ê li hemberî artêşa Tirk a neheq şerekî dişwar derdixê holê û roj bi roj ber bi demajoyên nû ve diçin. Dewleta Tirk dizane ku serî bi PKK re demaxe, dest bi hilweşandina gundan û navçeyan dike. Dibêje ku ez gundiyan qirr bikim dê PKK biqede. Ji bo vê armanca xwe ji hinek rêxistinên nijatperest alîkariyê dixwaze. Çiqas kesên ku dijaminê gelê Kurd in û dijaminê mirovahiyê ne, tifiingan didin destê wan û li dijî gelê Kurd didin şerkin. Bi zorê gundiyan li hev dicivînin û li hember PKK'ê didin meşandin. Hêzên dewletê dest bi qirkirina gelê Kurd dikin, ev rastî xwe ji her aliyê ve dide der. Bi hatina zivistanê re artêşa Tirk ji aliyekî ve çiyân didin ber bombeyan, ji aliyekî din ve jî gundan hildiwêşînin û dest didin ser xurekê wan, gundan vala dikin. Mirovan dixin bin çav. Gerîlayên ARGK'ê li gorî rastiya têkoşînê şer dikin û li hember neyar serfiraz dibin.

**11 Mijdar 1993:** Li Mêrdînê li navçeya Dêrika Çiyayê Mazî li herêma gundê Tavsiyê, gerîlayên ARGK'ê ji cerdevan û leşkeran re kemîn danî. Di bûyerê de 5 leşker hatin kuştin û 22 leşker û cerdevan jî birîndar bûn. Piştî bûyerê hêzên dewletê li herêma dest bi operasyonan kirin. Hêzên dewletê li Agiriyê piştî kuştina komsêrek û sê kesên din dest bi operasyonêke dorfireh kirin. Li Taxa Hurriyet û 100. yilê 6 kes xistin bin çav. Li gorî ajansa KUR-DHA'ê hêzên dewletê û peşmergeyên KDP'ê li hember PKK'ê amedekariya operasyonan dikin.

Li Culemêrgê li navçeya Geverê li ser Kolana "Güngörenê" hinek kesan bombeyek xistin dikana Alaattin Sarkmaz, li ser teqîna bombeyê avahiya SHP'ê û 50 dezgehên kar xesirîn. Ziyân 8 milyar e.

**12 Mijdar 1993:** Cerdevanan êrîş birin ser gundê Newala ku li ser navçeya Elihê (Batman) Hezoyê ye şewitandin. Li Ruhayê li

gundê Teltik a ku li ser navçeya Wêranşarê ye, hêzên dewletê avêtin ser li gundiyan îşkence kirin. Hêzên dewletê cerdî ser gundê Mûrkan ku li ser navenda Ardahanê ye kirin. Gundiyan bi kuştinê ve dane tirsandin.

Li Îdirê hêzên dewletê êrîş birin ser gundê Panikê, 6 kes xistin bin çav. Ji ber xurtbûyîna têkoşîna PKK'ê hêzên dewletê bi hovîti bi ser gel ve diçin kesan dixine binçav. Li Culemêrgê, li Agirî û Patnosê, li Mersîn û Adapazarê, li Erzeromê gelek kes ji aliyên dewletê ve hatine girtin.

**13 Mijdar 1993:** Li Culemêrgê avahiya Belediyeyê û mala Serokê DEP'ê ji aliyên hinek kesan ve hate xesirandin.

Endamê DEP'ê M. Nuri Güneş û 27 gundî li Dîgora Qersê û Aralixa Îdirê ji aliyên dewletê ve hatine girtin. Li Elihê, İzmirê, Stenbolê û li Licê gelek însan ji aliyên polîsan ve hatine girtin. Polîsên sivil Serokê DEP a Tuzlayê ya Stenbolê Eyup Gökçe û birayên wî xistin bin çav.

Hêzên dewletê avêtin ser gundê Herdeyê ku li ser navçeya Pîranê (Dicle) ye gundî çavtirsî kirin û xwestin ku gundî di navbera hefteyekê de ji gundê xwe koç bikin. Li gundê Qasimê jî ku li ser Çinara Amedê ye, hêzên dewletê 3 mal şewitandin û xurikê gundiyan li erdê rokirin.

Hêzên dewletê cerdî ser gundê Çingûşa Amedê Miçoyê kirin, 10 mal şewitandin û gelek mal jî xesirandin.

**14 Mijdar 1993:** Gundê Herderê ku li ser Pîrana Amedê ye, ji aliyê hêzên dewletê ve hate şewitandin. Du gundên ku li ser navenda Şirnexê bûn hatine bombekirin, 2 kes mirin û kesek jî birîndar bû.

Gerîlayên ARGK'ê êrîş birin ser tabûra Hezexê, piştî êrîşa gerîla, hêzên dewletê her derê navçeyê dane ber gulebaranê. Êrîş exleb li taxên "Yenî Mahalle" û "Aşağı Mahalle" yê çebûn. Di bûyerê de 60 kes hatin girtin.

Bi navê Kemal Canpolat kesek li Çinara Amedê ji aliyên dewletê ve bi îşkence hate kuştin.

**15 Mijdar 1993:** Leşkerên Qereqola Pasûra A-

medê êrîş birin ser gundên Gavgas, Argetin, Kûye, zozanên Tûr û Çîçekê, 18 mal şewitandin û 11 kes jî xistin bin çav.

Şerê ku di navbera gerîlayên ARGK'ê û hêzên dewletê de li navçeya Pasûrê li herêma Heredanê derket, ew 5 kesên ku di bûyerê de hatibûn kuştin û TV'yê ew wek terorîst nîşan dabûn, li gorî agahiyên herêmî ew 5 kes şivan bûne.

**16 Mijdar 1993:** Hêzên dewletê li Amedê li navçeya Pîranê avêtin ser gundê Herdan û Zozanê Tonekargê, 22 mal şewitandin û gundî ji gundê wan dane raqetandin.

Tîmên taybetê cerdî ser gundê "Aşağı Çamurluyê" ku li ser Aralixa Îdirê ye kirin, li hemû malan geriyan. Gundî giş li meydana gundan komkirin û ew tehdît kirin.

Li Îskenderûnê li Taxa "Yildirimtepe" di navbera polîs û hinek kesên nenas de şer derket, di bûyerê de jê du polîs 3 kes birîndar bûn. Bi navê Tefvîk Atakol kesek li Mêrdînê li navçeya Midyadê ji aliyê hinek kesan ve hate revandin. Li Agiriyê 25 şagirtên Fakulteya Perwerdehiyê ya Zanistgeha Atatürk ji aliyê polîsan ve hatin girtin.

**17 Mijdar 1993:** Hêzên dewletê avêtin ser gundê Gödeklîyê ku li ser Aralixa Îdirî ye, sê saet dane ber gulebaranê. Di bûyerê de 2 kes hatin kuştin. Li gundê Riz ku li ser Darahênê (Genç) ye hêzên dewletê 6 mal şewitandin. Gundiyan ku li der û dorên navçeya Hezoyê (Kozluk) ne, ji ber êrîşên dewletê koçî Hezoyê kirin; lê dewletê destûr neda. Gundiyan gundê Bayê ji ber cerdê hêzên dewletê koçî Culemêrgê kirin. Hêzên dewletê li Amedê li navçeya Pîranê gundên Qoçik û Şenoba ji aliyê hêzên dewletê ve hatine vala kirin. Ew gundê ku hatine valakirin leşker lê rûniştine. Leşkeran avêtin ser gundên Şirnexê Zêwka, Hoser, Serdehil, Cinbire û Mizgeftokê, gundî bi kuştinê çavtirsî kirin. Xwestin ku gundî ji gundên xwe raqetin.

Li Amedê 7 ebûqatên ku endamên İHD (Komeleya Mafên Mirovan)ê ne ji aliyê hêzên dewletê ve hatine girtin.

## HAWAR

Dilbixwîn

## Licê û bédengiya nivîskarên Kurd

**B**imeyîzînin! Eşkere derbasî nava kolan û taxên bajar û gundên me dibin. Dişewitînin, talan dikin, di-kujin û bédilovanî dest diavêjine namûsa me, keç û jinên me şût û tazî riswa dikin, zarokên me jî sêwî dihêlin. Bi van hovîtiyan nasekinin, diçin çand, dîrok û kelepura me ya neteweyî talan dikin.

Êşa Licê, nalîna jinan û qêrîna zarokên di bin zincîr û tekelên panzeran de, kê anî ziman? Kî li ser sekinî? Dinya ya yan jî rewşên bîr û nivîskarên Kurd?

Di serî de dixwazim vê bibêjim, dinyayê Licê nedît, nebihîst û naxwaze nas bike jî. Tu caran ev دنیا ya neyar nebûye yar û li me nepirsiye.

Kurd li ber bayê qirkirinê ne, Licê nimûneyek e. Di

**Nivîskarî şaş hatiye fêmkirin, karê rihet û bêwestabûn. Rewşa Kurdan nivîskarên hantal, xwînsar û yên ku xwe li hemberî gel berpirsiyar nabînin, napejirîne. Îro nebe wê sibê kuştîyên Licê mafê xwe ji me bixwazin, emê çi bersivê bidin? Gelo emê bikaribin li hemberî dîrokê û di dadgeha gel de bi serbilindî bibêjin, "Em bi pênuş û hunera xwe li Licê xwedî derketin?" Na! Emê nikaribin bersivê bidin, ji ber ku me bersiv nedaye.**

22'yê Cotmeha reş de ew şewitandin û kirin kavi. Kanî li ku derê ne ew hozanên ku biçin li ser helbestan bixwînin?!

Kesek li me xwedî dernekê, dostên hene jî cesaret nakin bibêjin. "Kurdanji qirkirinê biparêzin, bila ev neteweya çand-dewlemend qir nebe. Êrîşên diçine ser ra-

westînin". Nahêlin kes van gotinan bîne ziman, ne tenê ev, nahêlin em jî xwedî li xwe derkevin. Weke berê dixwazin me kerr, kor û lal bihêlin. Elbet em jî ne amade ne qirika xwe bidin ber kêra dijmin.

Bawer bikin dema ku min ew zarokên Licê, ew kalên ku hêstir di çavên wan de kom bûbûn, ew dapîrên kelegirî dîtin, min şerm kir.

Belkî ne li gorî dilê hinek kesan be, lê hema ezê bibêjim, dipirsim: Dema ku Licê şewitandin û kevir li ser keviran nehiştin, em rewşên bîr û nivîskarên Kurd li ku derê bûn? Di wan rojan de nivîskar û rojnamevanên Tirkan di nav seferberiyê de bûn, weke ebûqatan nedadiya xwe diparastin, me çi bersiv da? Di rojên wiha dişwar, aloz û asteng de delamet û rola me çi ye?

Weke her carî, careke din jî xuya bû ku, em nikarin Pênuş û hunera xwe di rewşên awarte de bi kar bînin. Di firehiyê de meydana dixwînin, di tengasiyan de jî deng ji me dernakeve, çima?

Nivîskarî şaş hatiye fêmkirin, karê rihet û bêwestabûn. Rewşa Kurdan nivîskarên hantal, xwînsar û yên ku xwe li hemberî gel berpirsiyar nabînin, napejirîne. Îro nebe wê sibê kuştîyên Licê mafê xwe ji me bixwazin, emê çi bersivê bidin? Gelo emê bikaribin li hemberî dîrokê û di dadgeha gel de bi serbilindî bibêjin, "Em bi pênuş û hunera xwe li Licê xwedî derketin?" Na! Emê nikaribin bersivê bidin, ji ber ku me bersiv nedaye.

Nivîskar çawa bi hestên gel dihesê, çawa xwedî li gel derdikeve û çawa jî dibe nivîskarê gel, divê em van der-san hîn bibin, hê me rola pênuşa xwe baş nas nekiriye. Lewma jî dema ku em radihêjinê, em diheyirin, nizanin çi bibêjin.

Em li benda çi ne? Bawer bikin di vê dinyayê de nivîskarên ku weke me bi êşa di kezêba me de bihesin tune ne. Ên di meydana de em in, an emê bibin nivîskarên azadiyê, an jî tu caran mafê me nîn e em xameya Apê Mûsa, Apê Osman Sebrî û pênuşa hevalên şehîd hilgirin.

Werin bila pênuşên me jî weke yên Gogol rojevê biguherînin: "Ji pênuşa min cenawerên wisa difirin ku, min jî ecêbmayî dihêlin. Heçî kesê ku lê dimeyîzîne, ji tirsan re lerzîn dikeve canê wî..."!



# Ewrûpa naxwaze pirs Kurdan fêmbike

**Yekda Welat/ Almanya-** Kurd li Ewrûpayê çiqas li ser cengê, têkoşîna xwe û mafên mirovan civîn, şadîmanî çêdikin û agahiyan radigihînin jî, her dem mirovên Ewrûpî û rêxistinên wan li bûyera Kurdistanê bi çavê kategorîstî û li gorî çanda xwe mêze dikin:

"Kurd bila şer nekin, Kurd ne netewe ne, serxwebûn ji bo Kurdistan ne baş e, Kurd ne yek in, Kurd nikarin li dijî leşkerên Tirkiyeyê ango yê NATO'yê şer bikin, Kurd tenê bi zimanê xwe biavixin bes e, dewleta Tirkiyeyê dostê Ewrûpayê ye û demokrat e û hwd."

Ew gotinên jorîn di civîn û axaftinan de ji aliyê parlamenterên Ewrûpî û gel û rêxistinên wan ve tê gotin.

Ji Ewrûpayê re ya pêwist ew e ku mirov di kîjan cepheyê de cihê xwe digire. Dû re li ser pirsgerêkan radiwestin. Kurd endamên NATO'yê ne an na, endamên dewletên Bakur (ên dewlemend), an jî endamê dewletên Başûr (cîhana sisiyan a hejar) in, bêtî Kurdan li Kurdistanê kedxwarî dikare çêtir were domandin an na, Kurd û têkoşîna wan reformîst e, an jî bi rastî demokrat e (reformîstî jî bo Ewrûpiyan ramaneke baş e)...

Di vî warî de ragihandinên li Ewrûpayê jî, bi awayekî sistematîk û zanîn di radyo, televîzyon û rojnameyên xwe de li dijî daxwazên Kurdan yê mirovî radiwestin. Agahiyên çewt û şaş di nav gel de li Ewrûpayê belav dikin, di her karê xwe de Ewrûpî hesab dikin çî ji bo ber-

jewendiyên wan yê aborî, siyasî baş e û li gorî vî yekê jî çend hezar mirov bi-mirin an nemirin, hingavtin hebe an nebe, mirov bi çekên kîmyewî werine kuştinê hîç ne girîng e.

Sekreterê Wezîriya Karên Derve yî ya DYA (Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê) yê Eliot Abrams wiha dibêje: "Li ser mafên mirovan wek li Nikaragua, El

**Ji Ewrûpayê re ya pêwist ew e ku mirov di kîjan cepheyê de cihê xwe digire. Dû re li ser pirsgerêkan radiwestin. Kurd endamên NATO'yê ne an na, endamên dewletên Bakur (ên dewlemend), an jî endamê dewletên Başûr (cîhana sisiyan a hejar) in, bêtî Kurdan li Kurdistanê kedxwarî dikare çêtir were domandin an na, Kurd û têkoşîna wan reformîst e, an jî bi rastî demokrat e (reformîstî jî bo Ewrûpiyan ramaneke baş e)...**

Salvador û hwd. em zêde rawestiyân... Ji me re karê siyasî û kedxwarî pest e..."

Gelê Kurd divê di tînin xwe yê li ser Ewrûpayê biguherîne. Dewletên Ewrûpayê ne dost û hevalên gelên bindest in. Kî bi hêz be, dewlemend be, kar li ku derê hebe Ewrûpa dostê wan e. Têkoşîna Tevgera Neteweya Kurdistanê îro bi gelê Kurd re bûye yek. Du cephe (bere) hene, dewleta Tirk bi leşker û hevkarên xwe ve û gelê Kurd jî bi PKK'ê ve. Ji bo Kurdan objektîvî û rastî ev e.

Rast e, li Ewrûpayê baş li ser mafên mirovan jî bo Kurdistanê diaxivin. Lê Kurd jî bo mafên xwe, ji bo mafên mirovahiye li ber xwe bidin êdî Kurd dibin "terorîst". Heta "dostên" Kurdan jî di-kevin astengiyên. Ji bo axaftina li ser mafên mirovan amade ne, ji bo alîkarî û piştgiriyê, lê ku gelê Kurd dest pê di-ke û şoreşeke nû ji bo guherîna civakî û

Kijan mirov û dewleta Ewrûpî li ser ku her roj zêdeyî 40 hezar zarok li Afrîkayê ji ber birçîbûnê dimirin, nêzikî 20 milyon mirov bê nan û xêrî ne, nêzikî 2 milyon Kurd ku îro li Kurdistanê bûne penaber û hwd. difikire an radiweste.

Di her warî de Ewrûpî xwe wek navendê dibînin. Navê vî îdeolojiya împeryalistên Ewrûpî jî eurocentrîzm e. Ev tê wê wateyê ku Ewrûpa her tiştê xwe ji dewletên din çêtir dibîne. Ev bîrdozî (îdeoloji) ya nijadperest û kevneperest dixwaze cîhanê kontrol bike. DYA girêdahiye vî bîrdoziyê ye.

Gabriel Garcia di sala 1982'an de Xelata Nobelê ya Aştiyê stand û di axaftina xwe de daxuyand ku rastî û hebûna Latîn Amerîkayê bi kategorî û şêlê tîtin û bi çavên Ewrûpiyan lê ne bi çavê mirovahiye li wan tê mîze kirin. Gabriel Garcia Marcuez digote ku bi van kategorîyan mirovan jî rastiyan dîr dixin, çandêke biyanî didine wan, bi zindî wan dikin girtîgehên û wisa dikin ku mirov xwe wînda bikin û êdî xwe bi xwe nas nekin.

Wiha jî dixwazin ew tiştên jorîn li Kurdan bikin. Lewre rastiya Kurdan divê her tim wek Ewrûpiyan be. Serxwebûn û azadî di mejî de dest pê dike. Serxwebûna siyasî, çand, ol, sêrpahatî, zanyarî û şoreşgeriya Kurdan jiyana wan e. Kî bixwaze van tiştan ji wan bistîne, an jî li gorî xwe biguherîne, bêguman ew ne hevalê gelê Kurd e.

## Lêtojiñewey Ednan Yasîn be nihênî

**Nûûçeyên Derve-** Hem Bel'awî sefirî Felestin le Tûnis guftî kewa lêtojiñewey legel Ednan Yasîn be tometî deskîzî bo dezgay ajanî Îsraîl MOSSAD le mawey yek heftey dahatû da be kota degat. Herweha Bel'awî daway le gîşt rojname û dezgakanî rageyandin kird bo ewey ber le bilaw kirdnewe le zanyariyekan bikolinewe û zanyariy nadurust û nawird pêşkêş neken û karekî wa neken ke bibête hoy peşokan û şilejawî.

Bel'awî guftî: "Êsta hemû şîtêk lem bareyewe be şeweyekî nihênî berêwe deçê, paş ewey lêtojiñewey degate encam ew dem daw û dezgay rageyandin mafi eweyan debê hemû wîrdetiyek bizanîn û bilawî bikenewe." Herweha guftî: "Sercem ew şitaney ta êsta bilaw bûnetewe mezende na dirustîn û birîtin le pirkirdinewey boşayî."


Diway eme Bel'awî guftî: "Le maweyek lemewpêşewe gumanman le Ednan



Yaser Arafat

dekird, boye kar û erkî ewman kem kirdibûwewe. Belam Ednan lemewpêş da ne le dîr û ne le nîzik hîç pêwendiyekî be karî asayîş û siyasetewe nebûwe."

Herweha le barey kesayetiy Ednan Yasîn ewe guftî: "Kesêkî bîrteng e, hîç zemîneyekî siyasî û ronakbîrî pitewî niye ke rêgey neda bo karî awha." Carekî tir le barey xêzan û mindalekanî ewe we guftî: "Xêzanî Yasîn wek caran jiyani xoyan beser debên û kes pîyan nalê le pişt çawtan biroye." Û "Herweha



Ednan Yasin

jînî Ednan ke be hoy nexosîy şêrpencewe le nexosxane da ye û le ser mesrefî RRF çareser dekrêt wekû caran çareser kirdinî berdewam debêt.

Bel'awî le barey Hani'y kurî Ednan Yasîn ewe guftî: "Hanî be heman tometî bawkî gîrawe, belam ta êsta hîç tometekî leser nekrawe be mal."

**Rojnamey  
ASHARQ AL-AW-  
SAT  
11.11.1993**

## Kuşûbir le Cezaîr da

Dway helweşandinewey helbijardin û rageyandinî barî kitûpîr le seretay salî 1992 ewe barêkî nalebar wek reşebayek helî kirdote ser hemû çareserêkî siyasî le nêwan hêze Cezaîr. Witûwêjî siyasî û aştbûnewe le nêwan hêze nîştîmanî û ayîniyekan da hemîşe le nûçdan da bûwe.

Tîrorî hêze radikale Îslamiyekan roj be roj pere desênê. Le miyaney em tundûtîjiyane da pitir le 1500 kes kujrawîn, le mane 500 yan le hêzî asayîş û dû hêndeş le radikale Îslamiyekan, herweha 5000 iy tîrîş be hîway dadga kirdin û 100 kesîş fermanî le sêdare danyan bo derçûwe. Wêray emêş deyan swîlî bêtan û rojnamenûs û ronakbîr reşekuj kirawîn.

Hêze Îslamiyekan geyîştûnete ew bawerey ke îtir natwanî binkey rêjîm be zebîrî hêz heltekênî boye deyanewê xoyan le rûberûbûnewey supa bibwêrin û kewtûnete dway reşekujkirdinî ronakbîr û rojnamenûsan û kesânî bêwerî le rêjîmî siyasî, emêş bûwete hoy hestânî rik û bêzariy cemawer.

Ew şitey ke bûwete hoy ewey radikale Îslamiyekan ziyatir destî xoyan bawêne piyaw kuji û karî tîror ewîs ewey ke kewtûnete barêkî goşegîrî û bê hîwayî. Karî gîreşewênî bûwete hoy sûtandinî gelêk fêrge û karge û dawûdzagay ronakbîrî û abûrî



Maleke ji hêla polisên Fransewî ve li hevketî

û kuştinî piyawanî rageyandin, herweha kuştinî fermanberanî wilatanî derewe, wek: Kuştinî dû hawnîştîmanî Fransî û dû Rûsî. Herweha rifandinî 3 kesî Emerîkay Latîn û 3 Fransî. Em karane hemûy be niyazî ewe dekrên ke gîreşewênî berdewam bêhelûmercî welat be şewawî biçête rêwe.

Em kuştûbirrey ke hêze Îslamiyekan le Cezaîr da encamî deden be şeweyekî nalebar rengî dawetewe ser pêwendiy nêwan Fransa û Cezaîr, belam çawdêre siyasîyekan delên: Sereray rifandinî sê fermanberî ser be bal-yozxaney Fransa û bangewazî koç bê kirdinî 25 hezar hawnîştîmanî Fransa lewî, belam çawerwanî ewe nakrêt pêwendiy nêwan Fransa û Cezaîr bigate radey birînewey yekcarekî.



# Zarokên Agirî û rûreşiya Ewrûpayê

S. Berbang

Rayedarên NCM (Navenda Çanda Mezopotamya) ê roja 15'ê Mijdarê ji bo daxwaza alkariyê û danasîna xebatên xwe balyozên 9 dewletên Ewrûpayê vexwendin konsereke zarokan. Lê ji bilî balyozê dewleta Holandayê tu kes nehat. Wî jî nexwast wêne bînîşandin û piştî konserê nixandineke kurt kir û li ser daxwaza alkariyê jî tu soz nedan, tenê got: "Em dê binêrin." Piştî re xatir xwest û çû. Ev tişt helwesta dewletên împeryalist li hemberî doza Kurdan nîşan dide.

Piştî konserê mamostayê zarokan Yetkîn li ser armanca sazkirina konserê wiha got: "Em muzikaleke ji 9 zimanan pêkhatî amade dikin, em dixwazin, pêşandana li hemû welatên demokratîk li dar bixin û di pêşandana xwe de timtêlên van welatan bi kar binin. Di vê yekê de me pêdivî bi alkariya balyozên van dewletan heye. Hem di der bidestxistina timtêlên de hem jî ji bo pêkhatina konseran (ji ber ku divê em konser bi vexwendina wezîrên çandê yê van welatan çêbibe). Armanca çêkirina xebateke bi vî rengî ev e; em dixwazin, zarokên me bi zimanên xwe perwerde bibin û dawî li şerê qirêjî bibe."

Balyozê Holandayê jî wiha got: "Ez spasiyên xwe pêşkêşî wê dikim, ji ber ku we xebatek bi vî hejahiye pêk aniye. Em dê ji bo pêkanîna daxwaza we li gorî mercan bigihîjin encamê, em dê hewl bidin xwe û binêrin."

Li dû çûyîna balyozê Holandayê Mamosta Yetkîn ev agahî dan me: "Wek me pêşî jî got



Gulên Mezra Botan, Zarokên Agirî bi zêdeyî deh zimanan stranên biratiya gelan dibêjin.

em li ser muzikalekê dixebitin, ev kar li ber kutabûnê ye. Ev dê ji peyv, stran û dansê pêk were. Di vî muzikalê de ji bilî 9 zimanên cihêreng em dê timtêl û dansên çandên cur be cur jî bi kar binin. Niha 110 zarok di bin banê NCM'ê de di warê çand, muzik û zimanê Kurdî de tîr perwerdekirin. Ji ber ku zehfên zarokan diçin dibistanên Tirkî, tenê ji heftê rojekê tîr vê derê. Em dixwazin bi awayekî rêk û pêk wan bigihînin. Piştî kaseta yekemîn em çûn Ewrûpayê, me li gelek bajarên Ewrûpayê konser çêkirin, li wir me dît ku bandora stranên bi zimanên wan pirtir e li ser wan. Lewre hizra muzikaleke wisa hat hişê me. Em dixwazin li he-

mû dewletên Ewrûpayê konseran bidin. Li aliyê din em dixwazin kaseta xwe ya duyemîn tomar bikin û bidin UNISEF'ê ku ji bo alkariya zarokên cihanê bifiroşe; bi vî amanca me ev e: 1-Daxwaza zarokên me ji bo perwerdebûna bi zimanê makî û dawî lê hatina şerê qirêjî ji devê wan li hemû dinyayê belav bibe.

2-Fedîkarkirina van dewletên qasê demokratîk û deşîrêkirina helwesta wan li herberî doza Kurdan. Ji niha ve di gel hemû tengasiyên em tîr de ne, zarokên em li zarokên cihanê difikirin û em pêşengiya astixwaziye dikin. Heke ev dibêjin zarok gerdûnî ne û pêseroj in divê alkariya me bikin. Bi rastî

ji bo me hemû zarok yek in, lê rûyê Împeryalizmê reş be, we dît ji 9 dewletên vexwendî tenê Balyozê Holandayê hat."

Zimanên ku di muzikalê de bi kar tên ev in; Îngilîzî, Fransî, Erebi, Farisî, Almanî, Yewnanî, Tirkî, Ermenî û Kurdî. Ojînalê giş peyvên Kurdî ne. Ji dewletên Ewrûpayê tenê naxwazin li Brîtanya Mezin û Îspanyayê konserê bidin, ji ber ku wan dewletan dema konsera wan helwestek nebaş nîşan da ye. Mamosta Yetkîn daxuyand ku, ew hikûmeta Îngilîz bi tundî protesto dikin ji ber ku wan wîze neda ji bo konsera wan a yekemîn û ser de jî gotin: "Hûn dê îltîca bikin, lewma em wîzeyê nadin we."

## Şeva DEP'ê ya şahiya aşî û biratiyê

S.S.Dilpolo.

Partiya Demokrasiyê bi navê "Şahiya aşî û biratiyê" şevê li dar xist. Mebûsê DEP'ê Hatîp Dicle, Sekreterê Giştî yê DEP'ê Îbrahîm Aksoy, gelek rewşenbîr, mamoste û sendikavan beşdarî şevê bûbûn. Îbrahîm Aksoy û Hatîp Dicle di axaftinên xwe de daxwaz ji gel kirin ku, di hilbijartina Adarê de hay ji dengê xwe hebin. Dengê xwe nedin kedxwar û xwînrejan. Şev bi awayekî xwe li dijî xwînreji, cinayetên failê meçûl, qirkirina gelê Kurd û vî cenga gemarî pêk hat.

Di şeva Aştî û Biratiyê de nêzîkî 2000 temaşevan amade bûn. Şev bi Merşa Ey Reqîb dest pê kir. Pîr, Kal, Xort, Keç û ciwan, tevî destên xwe hildabûn û tilikên serfiraziye şanî didan û deng bi ser Stenbolê diket. Serokê DEP'ê Stenbolê DR, Kemal Parlak di peyvîna xwe de wiha got: "Yên îro Licê dişewitînin, dê sibê ji we dengê (raya) we bixwazin. Divê em di hilbijartina Adarê de, ji bo mafên xwe, neteweya xwe û li dijî xwînrejiyê, qirkirina Kurdan û vî cenga gemarî dengê xwe

bikar binin". Îbrahîm Aksoy: "Hinek kesên siyasi û partiyan siyasi, naxwazin doza me fêm bikin, lê mecbûr in fêm bikin. Ji ber ku doza me demokrasi ye, parastina mafê mirovan e û li hember kedxwar û xwînrejiyê ye. Divê di dema hilbijartina Adarê de em dengê xwe li hember qetliamên dewletê bidin".

Serokê Belediyeya Liceyê: "Tansu Çiller xanim di hilbijartina Adarê de, dê bibêje ku, belê ew bûn ên ku Licê şewitandin û kavi kirin. Em tika ji we dikin ku haya we ji dengê we hebe. Em bi van gotinên xwe tîr da-

rizandin, lê em natirsîn. Em bîn îdamkirin jî, emê doza xwe bidomînin. Niha armanca dewletê ew e ku hilbijartinê bide paş, lê ez bawer im ku hûn dê bi vî yekê nexapin. Ez deng li we dikim Karmendno! ew 4 milyonên ku hûn distînin, milyonê dewlet jê dibire û li vî cenga gemarî dide. Bipirsîn li mafên xwe bipirsîn. Bi pereyên we bila xwîn nerije!"

Hatîp Dicle: "Ez dixwazim bibêjim, belkî zarok ji min fêm nekin, dema çûn malê bila ji dayik û bavên xwe bipirsîn ku, Apê Hatîp xwest çi bibêje di çî-

roka xwe de. Belê, hîrçek hebû û tim hingivê mozan didizî, dema hîrç dizî dikir mozek dudo bi wî vedidan, lê li wî hîç tesîr nedikir. Dîsa rojek hîrç diçe di ziyê di holika mozan de kewarên mozan tev bi ser ve dixingirin û mozên kewaran tev rapûşkê hîrçê dibin, bi her deverên hîrçê vedidin. Ji hîrçê re du rê hene, yek rev, dudo mirin e. Niha em ji hîrçê re dibêjin; hîrçê lawo bireve, tu dê bimirî bireve!" Hatîp Dicle, ciqas jî çîrok ji biçûk û mezinan re gotibe jî, xwe jî gotinên siyasi jî dîr nekir. Piştî van axaftinan, hunermend û stranbêjên Kurd bi dorê derketin sehneyê govend girtin û stîrîn. Li ber muzik û stranên Kurdî, xort û keçên Kurd xwe negirtin li her devereke bi milên hev girtin û govend girtin.

Stranbêjên ku beşdarî şevê bûbûn ev in: Ganî Nar, Fevzî Kurtuluş, Koma Xerzan, Mizgîn, Bahoz û Şehribana Kurdî, Dema Şehribana Kurdî "Hey hey hey, 1, 2, 3, 123, hevalan qet natirsê. Emê welat rizgar kin çavê dijmîn birijê", digot salona dagirtî, tev bi hev re li dû wê dubare dikirin.



### Kurtenûçe

#### Polis girte ser Zagros

Roja 12.11.1993'yan polisên girêdayî ekîba "tekoşîna bi terore" re, girtin ser Weşanxaneya Zagrosê. Polisan ji xebatkarên weşanxaneyê Îlyas Burak û Erdal Kür, tevî 600 pirtûk û arşîva weşanxaneyê (weşanên ku hatibûn qedexekirin yê weşanxaneyên din) bi xwe re birin.

Weşanxaneya Zagros ta niha 8 pirtûk çap kiriye û ji van pirtûkan 4 heb, ji teref Dadgeha Ewlekarî ya Dewletê (IDGM) ve hatine komkirin. Pirtûkên ku hatine komkirin yê Abdullah Öcalan, İsmail Beşikçi û Yaşar Kaya ne. Li ser vî bûyerê xebatkarên Zagrosê belavokek belav kirin, di belavokê de wiha tê gotin: "Weşanxaneya me ev ne carek e ku wiha bi ser ve tê girtin, berê jî çend caran bi vî awayî bi ser weşanxaneya me ve girtibûn, pirtûkên me talan kiribûn, xebatkarên me xistibûn bin çav."

#### Pirsgirêka Kurd

Pirtûka "Pirsgirêka Kurd", hate komkirin. Hevpeyvîna Oral Çalışlar (nivîskarê Cumhuriyetê) ku bi Abdullah Öcalan û Kemal Buray re çêkiribû û dîv re jî kiribû pirtûk, ji hêla Dadgeha Ewlekarî ya Dewletê ve hate komkirin. Wek tê zanîn ku ev hevpeyvîn, ji hêla rojnâmeya Cumhuriyetê ve, berî niha bi çend mehan hatibû weşandin û der heqê hevpeyvînê de tu dawê nehatibû vekirin.

Ev pirtûk jî hêla weşanxana Pencere ve hatiye derxistin.

#### Serîlêdana Zana

Komîsyona Mafên Mirovan a Ewrûpayê, serîlêdana Mehdi Zana ya di 1992'î de hatibû kirin, biryar da ku wê hildin lêkolînê.

Serîlêdana Serokê Belediyeya Amedê yê kevin Mehdi Zana ya li dijî Tirkiyeyê, ji aliyê Komîsyona Mafên Mirovan a Ewrûpayê ve hate peji-randin. Zana ji ber daxuyana ku di 1987'an de der barê PKK'ê de ji rojnâmeya Cumhuriyetê re kiribû hatibû mehkûmkirin û serî li komîsyonê dabû ku biryar li dijî Peymana Mafên Mirovan a 10. e.

#### Dengê Amerîka

Xebatkarên Radyoya Dengê Amerîka (Voice of America) Beşa Kurdî ji ber ku belavokek rêveberiya dewletê ku tê de ditînen DYA'yê yê fermî li ser pirsgirêka Kurdan û li dijî PKK hebûn, neweşandin hatin îkazkirin. Li ser îkazkirina rayedarên Radyoyê ev belavok, piştî sê rojan hate weşandin. Xebatkarên Radyoyê bi giştî Kurdên Başûr in.



Di bajarvaniya Rojhilata Navîn de


# Rêberiya Mezopotamya

Dema mirov dîroka mirovahiyê dinirxîne tê dîtin ku mirovahî di sînga Rojhilata Navîn de çêbûye, gav avêtiye û bi pêş ketiye. Lewma jî, ji sînga Rojhilata Navîn re Mezopotamya dibêjin. Jê re "Dergûşa bajarvaniyê" jî tê gotin. Bi rastî ev gotin pirr bi wate ye, pîroz e û rîsta (rola) ku Mezopotamya di dîroka dinyayê de lîstiyê diyar dike. Wekî din tê zanîn ku hersê ol, ango yahûdîtî, xiristiyanî û misilmanî jî li vê herêmê bilind bûne û bandora xwe li ser raman û jiyana mirovahiyê kirine û rêberiyek şoreşgerî-civakî pêk anîne, di dem û merheleyên herî zor de dîsa ji hêla dargî (madî), erdnîgarî (cografî) û berhemên ser ax û tîn ax ve (neft, maden, av û hwd.) gelek dewlemend bûye û di dîrokê de şaristaniyên pirr mezin ava kiriye û ronahî daye dora xwe. Tê zanîn û gotin ku gelên ji mêj ve xwedî û rûniştvanên Rojhilata Navîn in, gelên Erebb, Faris û Kurd in. Wekî din tê zanîn ku, Kurdistan di nav dilê Rojhilata Navîn de, tevî gelê wê kirine çar parçe û ji wê rojê ve birîna kûr bi leyî û laserên xwîne der dide û diherike.

## PIRSGIRÊKA HERÎ GIRÎNG

Îro li Rojhilata Navîn pîrsgirêka herî mezin, pîrsgirêka Kurdî ye û heta ev pîrsgirêk bi awayekî şoreşgerî neyê çareser kirin tu pîrsgirêkên din çareser nabin. Me di destpêkê de diyar kir ku, ji ber rîsta mezin û dîrokî ya ku Mezopotamya lîstiyê, jê re hatiye gotin "Dergûşa bajarvaniya dinê". Heya îro jî dema navê Mezopotamya tê gotin, di dil û ramanên mirov de evîn û rêz hişyar dibe û tîstên delal, xuyangên rengîn tîn ber çavên mirov. Lê mixabin dema ku mirov li rewşa Mezopotamya ya niha mêze dike, dilê mirov xerab dibe, mejî û ramanên mirov naxwaze ku vê rewşê şêlo û bi ewr bipejirîne. Lewre dema mirov rewşa dema îro berbiçav dike, mirov dibîne ku îro Rojhilata Navîn bûye wek bexçe û hewşa împeryalistan. Dewlet û civakên kevneşopî yên Rojhilata Navîn îro lebatên layîqî dîrokê pêk nayîn û polîtîkayên serbilind û radikal li hember împeryalistan li dar naxin. Berjewendiyên herêmî, civakî û gelêrî naparêzin, xurt nakin, difiroşin û pêşkêşî împeryalistan dikin.

**B**i rastî jî lîstokên împeryalistan li ser Rojhilata Navîn gelek in, tevlihev û tarî ne. Ji ber ku împeryalist li Rojhilata Navîn dimijîn, paşvemayî û nezaniya felan û desteka hevkarên baş bi kar tînin û dixwazin ji bo berjewendiyên wan heya dawiyê rewşa herêmê û gelên wê wiha şîlo û serobino bimîne. Gel û civakên Mezopotamyayê pirr paşvemayî ne, di tarîtiyê de ne, di xewê de ne.



Di dîroka Rojhilata Navîn de bajarvaniya Mezopotamyayê xwedî cihekî girîng e.

Bi rastî jî lîstokên împeryalistan li ser Rojhilata Navîn gelek in, tevlihev û tarî ne. Ji ber ku împeryalist li Rojhilata Navîn dimijîn, paşvemayî û nezaniya felan û desteka hevkarên baş bi kar tînin û dixwazin ji bo berjewendiyên wan heya dawiyê rewşa herêmê û gelên wê wiha şîlo û serobino bimîne. Gel û civakên Mezopotamyayê pirr paşvemayî ne, di tarîtiyê de ne, di xewê de ne û ya herî girîng jî (ji bilî gelê Kurd) bê rêber in, pêşiya xwe nabînin û nizanin mafên xwe biparêzin.

## SIYASETÊN ÎMPERYALÎST

Ji bo ku împeryalist dijminên mirovahiyê ne, nuqteyên qelsiyên gelan, civakan û kesan jî baş tesbît dikin, ji destê xwe bernadin û ji bo berjewendiyên xwe bi kar tînin. Împeryalist plan û lîstikên xwe di her hêlî de û bi her rengî pêk tînin. Mînak; şerê psikolojîk a ku bi alîkariya çapemeniyê dimeşînin û şerê qirêjî ya ku bi destê leşker, tîm, xwefiroş, kontra û hevkarên pêk tînin. Li aliyê din, civak, malbat û yekîtiya gelan dipelçixînin, nahêlin ku mirovahî xurt bibe û bi ser keve.

Kesan dikin nav qalikan û heş û mejiyê wan ber bi berjewendiyên şexsî ve dibin. Dîsa malbatê jî hev parî bi parî dikin, ji bo her kesekî endamê malbatê (dê, bav, zarok) qalikek û dinyayek diafirînin, bi vî rengî jî malbat û civakê jî hev belav dikin, giyana bihevrebûn û yekîtiyê dikujin. Dîsa gelan berî hev didin, tovê dijminayetiye di nav wan de diçînin û ji bo berjewendiyên xwe, wan bi salan bi hev didin kuştin û birînen xedar di navbera wan de vedidin.

Polîtîkaya împeryalist û mêtîngehkar, ji bo civak, gel û neteweyan bi kurtasî ev e. Wesle bike, parî bike, bixe bindest û dema ku serhildan û tevgerên şoreşgerî bilind bûn wan tune bike.

Dema em li dîroka xwe binîhêrin, tê dîtin ku împeryalist û kedxwaran ev polîtîkayê li ser gel û welatê me jî bi tundî meşandine. Cara pêşîn em kirine du parçe (1639-Peymana Qesrî Şîrîn, di navbera Osmanî û Persîyan de), lê dilê wan bi vî rehet nebûye, bes neditine û dawiyê em kirine çar parçe (1923-Peymana Lozanê, di navbera dewletên împeryalist û Tirkîye, Îran, Sûriye û Iraqê de); bi vî jî ne-

sekinîne, vê carê nakokiyên eşîrî, herêmî, malbatî, olî, mezhebî û hwd. di nav me de peyde kirine û me berî hev dana, bi me lîstine û cerdevan, xwefiroş, sîxur ji nava me derxistine. Ev lîstik hê jî didomin.

## RISTA MEZOPOTAMYA

Em vegerin ser rîsta Mezopotamyayê ya rengîn a di dîroka mirovahiyê de. Dema ku mirov bala xwe didê, şewqa şoreşa me ya hemdem tê dîtinê. Bi rastî jî şoreşa me ya bi rêberiyê hemdem, herêmê bi xwe re dihejîne û ev rewş dilê mirov geş dike. Lewre şoreşa me serkêşiya mirovahiyê dike û çawa ku gelê xwe rizgar dike wisa jî mirovahiyê rizgar dike. Ji ber ku em jî parçeyek ji malbata mirovahiyê ne û ji ber ku dijmin dixwaze di hebûna welat û gelê me de mirovahiyê tune bike.

Bi hêsanî dikare bê gotin ku piştî bi sedan salan dîsa û ji nû ve Mezopotamya bi meş û xemla şoreşa Kurdistanê û bi rêberê wê, serkêşiya mirovahiyê dike û rîsta xwe ya pirr mezin dilîze. Belê, Mezopotamya berê dergûşa bajarvaniyê bû, îro bi awayekî şoreşger û hemdem dibe dergûşa serxwebûn û azadiyê, biratî, aşî û wekheviyê û pê re jî dibê gora împeryalizmê, faşîzmê û kedxwariyê, xwefiroşî û hevkarîyê. Divê rîsta şoreşa me baş were fêmkirinê û mirov bi dirustî li rîsta xwe ya şexsî, gelêrî; li barê xwe yê şexsî û gelêrî xwedî derkeve û bi serbilindayî bimeşe ta serkeftinê.

**Mizgîn Sipan**  
**Girtîgeha Amedê ya Navendî**

## Osman Sebrî

Tu yek ji çinarên kurdistanê yê

serbilind bûyî, bi biryarbûna te ya di doza Kurdî de û berxwedaniya te ya bi nav û deng, wê her dem ji me re rênîşandar bin. Bila bê zanîn ku em neviyên we her pêgirên van taybetiyên we ne.

**Hemû xebatkarên NÇM'ê**





Seretay kar hemû yekbûne ewîş  
nabê heta her birînê ke le dil da  
heye sarêjî nekey

Şukrî Fezlî (Şaûrekî Kurd)

# 'Pa tu çima guyê dayika xwe naxwî?'



Dema Mele Evdîlayê Timoqî zindî bû, rojekê Qomandarê Alaya Farqînê wî vedixwîne mala xwe. Seyda bi dilekî safî diçe mala qomandêr. Qomandar Beg jî sîfreke wisa amade kiribû ku, tenê şîrê çivîkê jê kêmbû. Her tişt li ser sîfrê dihate dîtin, heta mey jî hebû. Qomandêr ji Seyda re got: "Fermo Seydayê min êdî em rûnin xwarina xwe bixwin."

Seyda jî bi awayekî ser giranî rûnişt, dest bi xwarinê kir. Qomandar jî gepek xwarin dixwe û firek li meya xwe dixwe. Sohbeta Seyda û Qo-

mandar Beg germe germ e, li ser her tiştî mijûl dibin û dixavin. Piştî demekê Qomandar Beg bi Seyda hesiya ku, Seyda meyê venaxwe, tenê xwarin û fekiyan dixwe. Qomandar: "Seydayê min, fermo meya xwe jî vexwe. Seyda: "Na, nexêr ez venaxwim, spas." Qomandar dîsa îsrar kir: "De bixwe ez bi gorî, ji me pêştir kes li vir tune ne ku te bibinin, şerm neke û guneh jî bila li stûyê min be." Seyda: "Ne ji tirsê şêxan ez venaxwim, ne ji şermê ye jî ku min vexwara min dê vexwara."

Qomandar bi awayekî acizbûyî got: "Tu çima tirî dixwî zima mey jî ava tirî û hêjirê ye, tu çima mey venaxwî?"

Seyda: "Tu çima şîrê dayika xwe dixwî, lê gûyê diya xwe naxwî?"

Qomandar jî vê gotinê zehf hers bû û got: "Madem tu misilman î, tu çima bi wan komunistan re digerî?"

Seyda jî wiha bersivand: "Ma tu çima li gorî zagonên kafiran dimeşî?"

Qomandar jî vê gotina Seyda pirr aciz bû û berî wî da.

S.S.Dilpolo

## KÊ ÇI PEKAND?

Ew (mêbûsên DEP'ê) ne aîdî vê parlamentoyê ne. Lê ji bo demokrasiyê divê em hûrbijêr bin û hin kesên ji wan di parlamentoyê de bihêlin.

Îlnûr Çevîk

Berpirsiyarwê Rojnameya Turkish Daiily news



## Pêkeniyên dora Midyadê

### BI ŞEV JINA MIN E

Pîreka Pift gelek jê mezintir bû. Rojekê zilamekî henekoyî kete kîr û gote Pift:

Ev jinka pîr çiyê te ye?

Pift got: "Bi şev jina min e û bi roj diya min e."

### TE BÊHNA XWE BERDA?

Berê li gundan destavgeh (tuwalet) tune bûn. Roja îne ye. Piftî jî bo nimêjê, xwe edilandîye û di biniya malan re diçe ku here mizgeftê.

Pîrekeke gund li hewşê destavê dike û dixwe bîrikê û di ser sêncê re diavêje. Çima li nav ser û çavên Piftî nakeve.

Piftî dibêje:

Ha hooo. Te ez behdilandim...

Pîrek jî dibêje:

Wa weylê li min hetikiyê.

Piftî dibersivîne:

Na yadê... Te bêhna xwe berda.. Vêca yê hetikî bûme ez...

### XWEZÎ TU KEÇA MIN BÛYA

Gulê pîrekeke pirr xweşik bû. Rojekê Piftî li nava gund giha keça wê.

Got:

Nazo xwezî tu keça min bûya..

Nazo got:

Ew çima xalê Piftî?

Pift got:

Wê diya te jî jina min bûya...

### NE TIRSE APO

Zilamekî Bahwârî diçe ku, here Dêrikfan. Li nêzikî gund di ber rezekî re dibore. Dilê wî bijiya tirî. Xwe hilda ser diwêr ku, têkeve nav rez. Nêrî ku lawikekî şeş heft salî kêreke xweşik di desta de û tirî diqurêfe.

Zilâm di dilê xwe de got: "Ezê wî lawikî bi tirsînim û wê kêrikê jê bistînim"

Zilâm jî ser diwêr xwe di avêje nav rez û bi deng dibêje

Bee..

Kurik di beşîşe û dibêje

Netirse apo. Ez kêrê te jê nakim...

### BÊ WE JI KU BAZ DA

Bahwerya û Derikfanya li neqeba (nabera) herdu gundan, li hev û du xistin. Bahwerya reda (zora) Derikfanya birin û heta bi gund dane dû wan

Derikfan pirr qehirîn û gotin:

Da em herin wanê ku, ne hatine arî (alîkariya) me wê wan talan bikin.

Çûne devê deriyê Tahirê Horikê.

Gotin:

Bêxîret. Newêrek. Çima tu nehatî arî me?


Tahir got:

Hûn çî jî min dixwazin? Da em herin, bê we jî ku derê heta bi gund baz daye, ezê jî ji wir heta bi gund baz bidim û hew...

Berhevkar: Jîr Dilovan

## Jûjî...

## Doğan Güzel





Li Tirkiyeyê kes naxwaze leşkeriyê bike. Hejmara qaçaxên leşkeriyê gihîştîye 250 hezaran

# Artêşa Tirk çav berda xwendekaran

**Navenda Nûçeyan-** Artêşa Tirk her ku li dijî şerê çekdari yê PKK'ê bi bin dikeve, nexweşin û tengasiyên nû jê çêdibin -wek mirovwarê ku xwarin jê qut dibe û diranê xwe di canê gel de dadiçikîne - berê xwe dide gel.

Ji niha ve di gel ewqas nexweşinên giyanî, firar, xwekustinên di nav leşkeran de û xire cira di nav refên artêşê de, hejmara kesên ku ji leşkeriyê direvin jî gihîştê 250 hezaran. Xortê Kurd êdî yan diçin di nav refên artêşa PKK'ê de cih digirin, an jî direvin metropolên Tirkan ji bo ku leşkeriyê nekin. Xortên Tirk jî, ji xeynî hin nijadperestan naxwazin biçin şer canê xwe bidin. Ji ber vê yekê jî derî vîna rayederên dewletê hejmara leşkeran

kêm dibe. Her çiqas wan qala kêmkirina hejmaran leşkeran kiribe jî kêmbûyîneke bi vî rengî naxwazin. Ew baş dizanin ku (bi awayekî sergirtî be jî) di vê kêmbûyîne de daxwazeke gel a însanî veşariye. Di vê daxwazê de jî têkçûna wan heye, ji lew re li çareyên nû digerin, dixwazin rê li ber vê yekê bigirin.

Li gorî raporeke Eşref Bitlîs ku di rojnameya Aydinlik'ê de hate weşandin, tenê sala 1991'an di nav refên cendirmeyan de, hejmara kesên ku ji ber sedemên ji derî şer mirine 174 in, ya birindaran 942 ne, di eynî salê de 72 kesên çek berî xwe dane, hewldanên xwekustinê 24 in û 26 kesên ji xwe kuştîye. Ev rapor piçêkî rewşa artêşa Tirk diyar dike. Di vê raporê de der heqe koman-

doyan de û hejmara firaran de tu agahî nîn in. Li gorî reqemên ku Wezîrê Parêzkariyê dide, dewlet kare %40'ê kesên ku hatine salên leşkeriyê berhev bike. Yên din %31 xwendekar, %22 kesên ji leşkeriyê direvin, %7 seqet û %1 jî nekîfş in. Rayedarên dewletê jî çav berdane vê potansiyelê.

## TEMENÊ ÇÛNA LEŞKERIYÊ DADIKEVE


Komara Tirk amadekariya tundkirina şer dike, ji lew re dixwaze hejmara leşkeran pirtir bike. Her çiqas dixwaze bi hewte hewta çend nijadperestan rojevê dagire û ji bo vî karî cendekê leşkeran bi kar tîne jî, kesên aşîxwaz zêde dibin û bîrdoza kemalist jî bi kerî tiştêkî naye.

Pêşî, ji bo çareserkirina pêdiviya leşkeran, hizra leşkerên pîspor avête holê, lê tevî giş bertil û hewldanan negihîşt encameke erênî. Li gorî îstatistikên fermî, di sala 1992'yan de cihê ku di nav refên artêşê de ji bo leşkerên pîspor hatibû veqetandin, (23.745 kes) tije nebû. Piştî vê bi reklameke mezin avabûna artêşa taybetî îlan kirin. Lê ji bilî çend faşîstên nijadperest kesî guhê xwe nedayê.

Li dû hemûyan di gel qanûna terorê îcar berlêgirtinên nû hatin. Berdevkê hikûmetê fermana MGK (Lijneya Ewlekariya Netweyî) îlan kir. Li gorî agahiyên Wezîrê Parêzkariyê, di civînê de ev biryar hatin standin.

1-Divê ji bo kesên ku ji leşkeriyê direvin cezayên mezin bên dayîn.

2- Kesên ku dixwazin, di-



karin di 19 saliya xwe de bin leşker.

3-Divê dewletê nede kesên ku li ser navê xwendinê ji leşkeriyê direvin. Ji ber vê yekê kesên ku xwendina xwe ji 7 salan dirêjtir bikin, divê bibin leşker. Xwendekarên Fakûlteya Hindekariya ji derve (Açıköğretim) jî heke du salan li ser hev di polekê de bimin divê leşkeriya wan tecil nebe. Heke pêwistî çêbe, îmkân heye ku xwendekarên dibistanên ku mecbûriya dewamê jê re nîn e, bigirin leşkeriyê.

## BIRYARA PKK'Ê HIZRA AŞTIYÊ XURTTIIR KIR

Her ku gel pêşveçûyînen demokratîk û aşîxwaziye pêşniyar dike, dewlet bi biryarên tundî bi ser wan ve diçe, dixwaze gelê Tirk jî bike hevkarê şerê qirêjî. Xortên wan dişîne şer, lê piştî mirina wan jî tu alîkariyê pêşkêş nake, bes dema naştina

(veşartina) cendekan, çend nijadperest û polîsan dişîne ku li dijî gelê Kurd û PKK'ê sloganên faşîst biavêjin. Lê dema ew di dikevin dewlet bi giştî wan ji bir dike, hemû serîlêdanên lêzimên wan bêbersiv dihele. Dema ew hatin berdan jî, heke pesna geñla an jî PKK'ê bidin, îşkenceyê li wan dike. Edî lêzimên leşkerên di jî hêviya xwe bi giştî ji rayedarên dewletê birbûn, ji lew re serî li Komeleya Mafê Mirovan û nûnêrên NY didan. Pişt re jî, ji Serokê PKK'ê re nameyek şandin. Jê efûkirina zarokên xwe xwestin. Piştî demekê nûnêrên PKK'ê daxuyandin ku, ji bo parastina biratiya gelan, ewê di salvegera avabûna partiyê ya 15'an de, hemû leşkerên di û tûrîstan serbest berdî. Bi vê biryarê jî mafdariya xwe bi lêzimên leşkeran û tûrîstan dan peji-randin û bandoreke baş li ser mirovên aşîxwaz û pêşverû hiştin.

## ROJEVA WELÊT

### Lê ku leşkeriya mecbûrî nebe?

**P**irr nîn e hê du sal berê, dema Süleyman Demirel serokwezîr bû, digot: "Dê piştî bi demekê leşkeriya mecbûrî, ji holê rabe êdî kî bixwaze dê ew here leşkeriyê, li aliyê din emê ordiyeke profesyonel ava bikin.." û hwd. Di wê demê de mîjûya leşkeriyê ji 18 mehan daxistin 15 mehan, leşkeriya bi bedel, yanî bi pere derxistin, êdî kî bixwesta dikaribû pereyê mezin bida û neçûya leşkeriyê.

Ew demên ku Demirel qala wê dikir, hatin. Îro leşkeriya bi bedel ji holê rakirin, temenê çûna leşkeriyê ji 20 salî dadixin 19 salî, çav berdidin xwendevanên zanîngehan û ji bo kesên ku ji leşkeriyê direvin, cezayên mezin datînin. Di wê demê de digotin emê ordiya xwe biçûk bikin, îro ji bo hejmara leşkerên di ordiyê de zêde bikin, çi nemaye ku kalan jî, ji nû ve bikin leşker.

Baş e çi bûn di vî du salî de? Ev guherînen girîng ên di dewlet û ordiyê de ji ber çi pêk hatin? Çima ji sozê ku dabûne gel vegeyiran? Em bibêjin. Di van du salan de, têkoşîna çekdar a Kurd serfiraziyên mezin bi dest xistin û hejmara şervanan her çû zêde bû, lê di ordiya Tirk de berevajiyê wê pêk hatin. Hejmara kesên ku ji leşkeriyê direvin gihîştîye 250 hezarî, ewqas hejmar kes jî, ji bo xwe ji leşkeriyê rizgar bikin qeydî dibistanên ku mecbûriyeta çûnê tune, bûne; bi dehhezaran kes ji bo leşkeriya bi bedel pere dan û neçûn leşkerî nekin û bi vî awayî jî ordî pê kuta ser dewletê ku çareyek ji vî rawêşî re bê dîtin.

Bi propagandayên mezin bangî ciwanan kirin û derfetên mezin ji wan re pêşkêş kirin, ji bo ku bîr û di nav tîmên taybetî de cih bigirin. Lê ew hejmara ku ji bo tîmên taybetî tesbît kiribûn, nîve nîv jî nehate dagirtin, îro di nav qadroyên tîman de valahiyeke mezin heye. Dû re jî, ji bo ordiya taybetî dest bi reklamê kirin, lê li gorî ku xuya bûye dê nikaribin bigihîjin vê armanca xwe jî. Ew faşîstên ku piştî xwe bi wan girê didin û bi kar tînin jî nebûne çare. Çareyek bi tenê ji wan re dimîne, ew jî bi tehdît û tirsandinê komkirina ciwanan e, ji bo leşkeriya mecbûrî.

Lê tê zanîn ku şerê ne bi dil bê kirin, mehkûmî têkçûnê ye. Ciwanên Tirk, di şerekî ku bi armanca wê nizanin de bê dilê xwe tene kuştin. Hemû di wî şerê hov ê li Kurdistanê de, ji kesaniya xwe dûr dikevin û yên ku bi saxî ji vî şerî xelas dibin jî, bi nexweşinên mezin ên giyanî ve vedigerin malên xwe. Ev şerê qirêjî yê ku dewleta Tirk li Kurdistanê dimeşîne, ziyaneke mezin digihîjîne herdu civakan jî. Û weke ku di dîroka de gelek caran îsbat bûye, serfiraziyeke leşkerî ji bo wan xeyal e.

## YEKÎTIYA MAMOSTEYÊN KURD

Di mîjûya 20.11.1993'yan de. Li bajarê BRAUNSCHWEIG'ê (HAN-NOVER), YEKÎTIYA MAMOSTEYÊN KURD (YMK), kongereya xwe ya yekemîn li dar dixê. Di kongereya YMK'yê de, bi firehî rewşa siyasî tê nirxandin. Kar û barên yekîtiyê bi raporekê tê nirxandin. Destûra YMK'yê tê xwendin û nirxandin. Her wisa bi firehî li rewşa mamosteyan û zimanê Kurdî tê rawestîn. Di rojevê de gelek xalên din ên girêdahiyê kar û barên mamosteyan jî cih digirin.

Di dawîya kongreyê de şahî û pîrozkirina avakirina yekîtiyê heye.

### CİH:

Frizenbidungzentrum (FBZ) Burger Park  
(Stadt Bad) Braunschweig


Saet: 10.00-18.00'an (Axaftinên kongreyê)  
19.00-22.00 (Çalakiyên şahiyê)

Mêjû: 20.11.1993



# PKK'ê, bi mebesta rasthatina salvegera 15. a damezirîna rêxistinê daxuyaniyek belav kir. 'Di sala 15. de îktîdar a PKK'ê ye'

**Navenda Nûçeyan-** Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) ji bo salvegera partiyê ya 15. belavokek belav kir. Di belavokê de li ser şerê di navbera rêxistinên Kurd û artêşa Tirk de hinek tespît hatine kirin. Têkoşîna PKK û li hember siyaseta Tirk a neheq de nixandinek heye. Belavok li ser dîroka şerê rizgariya Kurdistanê, şerê PKK û serfiraziya partiyê, rewşa gelê Kurd a berê û niha, siyaseta dewleta Tirk û li hember PKK'ê havila wê şîrove dike. Di destpêka belavokê de wiha tê gotin: "Di dîroka gelê me de, têkoşîna me ya bi buhayê xwîn û canê me ku bi keda me hatibû domandin; cara yekemîn e serfiraz dibe. Ta niha gelek fedakarî hatibûn kirin, xwîn hatibû rijandin; lê tu tiştê (mafek) neketibû destê



Di 15 saliya damezirîna PKK'ê de hejmara gerîlayên wê ji 15 hezaran derbas bû.

me. Ev rewş ji bo gelê Kurd sedema bêhêvîtiyê û bedbîniyê bû. Lê îro têkoşîneke ku em ji bo wê bi hêvî û fedakarî bilivin û kar bikin hey e. Têkoşîna me ya bi bawerî û bi biryarek şidiya-yî, îro gihîştîye radeyeke bi zêrîn, ku wê serfirazî û serxwabûna Kurdis-

tanê çêbike." Belavok paşê li ser rol û rewşa serokê PKK'ê disekine, serfiraziya di bin xwestin û kirinên pêşengê rêxistinê (Abdullah Öcalan) dinirxîne. Bi giştî li ser riya PKK'ê û rola wî ya li Kurdistanê, bi hatina PKK'ê ve guherîna gelek siyasetan disekine û

wiha dibêje: "Bi hatina PKKê re rol û rewşa serdestan ên ku politîka xistine destê xwe winda bûn. Çarenûsa welatê me kete destê pêşengê rêxistinê (PKK), kete destê karker û gundiyan. Lewre yên ku ev 10 sal in fidakariya han kirin, xwîna xwe rijandin,

canê xwe dan û yên ku şer mezin kirin û em anîne vê demajoyê ew bûn. Şoreşa Kurdistanê bi saya kedkaran ve hatiyê standin. Di dawîya daxuyaniyê de têkoşîna gelê Kurd di bin siya PKK'ê de tê nixandin û ji gel, ji ronakbîran hinek tiştên xwestin. Daxwuyaniya wiha didome: "Gelê me yê welatparêz! Em li hember mîtingekariyê hov û xedar têkoşîna rizgarî û rûmetdariyê didin. Nêyarê me ji hemû nixên mirovahiyê dûr ketiye. Wisa dizanibûye ku bi zordestî wê xwe biparêze. Lê îro ji taybetiyên dewletbûyîne wînda kiriye. Destê wê dewletê bi xwîn e û ji bo terrore quwetek e. Ev dewlet îro li hember PKK'ê qels û bêçare maye. PKK sirf ji bo gelê Kurd na, ji bo gelê Tirk jî riyê serfiraziyê vedike".

## Zilma Fransa li ser Kurdan

### Destpêk di rûpela 1. de

Sebeba duyemîn ku ji ya yekemîn jî girîngtir e, biryarên NATO yên der barê Partiya Karkerên Kurdistanê de ne. NATO ji bo ku Tirkiye karibe bi PKK'ê re sereder bibe xwe ji her cure alîkariyê re amade nîşan dide. Tewra polisên Alman û yên Fransayê jî di nav vê çarçoveyê de tê nixandin. Weke tê zanîn, berî çend hefteyan bi zêdebûna danûstandinên rayedarên Tirkiye û Almaniyayê hevkarîya MÎT'a Tirk û BND'a Alman ketibû rojevê. Di ser van danûstandinan re hîna pirr west derbas nebûbû ku îstîxbaratên van her du welatan dest bi êrişbirina ser Kurdên li Almaniyayê dijin kiribûn. Erişên ji aliyê polisên Fransî ve hatin pêkanîn jî wek parçeyek jê vê plana Tirkiyê û dewletên împeryalist xwe nîşan didin. Li gor nûçeyên ji Fransayê digihîjin destê me, ger ev pest û hovîtiya dewleta Fransayê li hember Kurdan bi vî şêklî bidome, Kurdên Fransayê bédeng namînin û wê des bi livbaziyan girseyî bikin. ERNK, Navenda Informasyonê yê Kurdistanê û Komîteyên Kurdistanê bi daxuyaniyên çapemeniyê ev helwesta dewleta Fransayê protesto kirin.

### KÎ WELAT DIWEŞÎNE?

Li aliyê din polisên Fransayê bi ser mala nûçevana me ya Parisê, Bêrîvana Dêrsimî ve jî girtin û der barê rojnameya me de hin pirsên balkêş jê kirin. Li gor gotinên Bêrîvana Dêrsimî polîsan ev pirs jê kirine: "Hûn çima di Welat de dixebitin? Welat rojnameya kîjan partiyê ye, bi alîkariya kê derdikeve?" û hwd. Polisên Fransî bi van pirs û helwestên xwe bi rastî tu ferq di nav bera xwe û polisên Tirkiyeyê de nehiştin.

## Ebûqat jî tene girtin

**Navenda Nûçeyan-** Li Amedê operasyonên binçavkirinê yên li hemberî gel berê xwe dan ebûqatan jî. 7 ebûqatên endamê Baroya Amedê di van çend rojên dawîn de hatin girtin û hê jî di bin çav de ne.

Ebûqatên ku li Amedê hatine girtin navên wan ev in: Meral Beştaş Daniş, Sabahattin Acar, Şînasî Tur, Mesût

Beştaş, Arîf Altunkalem, Bakî Demirhan, Husniye Ölmez. Li ser girtina ebûqatan Serokê Baroya Amedê Fethî Gümüş tevî ebûqatên bi Baroyê ve girêdahî civînek çapemeniyê pêk anîn û daxuyandin ku, polisên ji wan re gotiye ku, di listeya wan de navê 10 ebûqatan heye û heta niha 6 ji wan girtine.

## Li dijî Tirkiyeyê daxwaza îtîfaqê

**Navenda Nûçeyan-** Wezîrê Pergala Dewletê yê Yewnanîstanê Stelyo Papatemelîs, li hemberî Tirkiyeyê îtîfaqê Kurd, Ermenî, Yewnan û Sûriyeyê parast û Tirkiyeyê wek dewleteke Asyayî nixand.

Stelyo Papatemelîs di nîvîsa xwe de ya ku berî bibe wezîr ku di rojnameya hefteyî ya Yewnan "Tovîma" ya hejmara dawî de hatiye weşandin, Tirkiyeyê wek rêqîbeke stratejîk dinirxîne û li

ser qelsxistina wê ya li hemberî Amerîkayê disekine. Di nîvîsa bi sernavê "Divê em Amerîkayê îkna bikin" de li ser pêdiviya ku li dijî Tirkiyeyê îtîfaqê bene çekirin radiweste û "Pêwistiyeke e Kurd, Ermenî an jî bi Suriyeyê re îtîfaqê bene çekirin û dikare were pêkanîn jî" dibêje.

Papatemelîs Tirkiyeyê wek welateke Asyayî dibîne û ji bo qelskirina wê jî li ser sebeban radiweste.



## Operasyonên pêşmergeyên PDK'ê û YNK'ê rawestiyan


**Navenda Nûçeyan-** Operasyona ku di 14'ê Mijdarê de ji aliyê hêzên YNK û PDK'ê ve li hember gerîlayên PKK'ê, li başûrê Kurdistanê dest pê kiribûn bêtî ku şerek derkeve rawestiya.

Operasyona li hember gerîlayan ji du mêlan ve dest pê kiribû û 3 serleşkerên Tirk tevî 2 komutanên ji YNK'ê vê operasyonê birêve biribûn. Pêşmergeyên di bin emrê Mamosta Bapîr û Avla

Bor di operasyonê de ta ber tixûbê Qilaban (Uludere) hatibûn. Li gorî KURD-HA'yê di vê operasyonê de hêzên leşkerî yên Tirk jî bi bafefiran herêmên Elcana Qilaban û Sinnahta başûrê Kurdistanê bombebaran kirin.

Li aliyê din nûnerê PDK'ê yê Enqerê Seffîn Dîzaî beyanek da Ajansa Anadolu û daxuyand ku, ta niha şer derneketiye. Lê ger PKK jî tixûb ve nekişê dê xwîn birije.

## Fermendar Pîro û Şukru:



Turgut Yildiz

Roj bi agir xemilîbû  
Gul sor dikenîyan  
Lê ew hatin...  
Dema li ser axa welat  
Dest bi cengê kirin  
Destaneke  
Bî rûmet nivisandin



Erdîven Bozkurt

Li ser çiyayên  
Olûra Erzeromê û  
Şehîd ketin yek bi yek;  
Wek 21 kevokên aştiyê  
Stêrk şahidê we bûn...

RESUL GALÎTEKÎN



# Yê Kurdî, yê Kurdan û yê Kurd

Baran Rizgar

Yek ji mirov bipirse, bibêje: "Kurdî çi ye?" Bêguman, bêtir ramanên zêde, mirov dê bibêje: "Kurdî zimanê Kurdan e." Weke ku bi Tirkî dibêjin "Kürtçe", bi Îngilîzî dibêjin "Kurdish", hwd. Niha hin xwendevan dê bibêjin: "Ma ev jî pirs e? Herkes bi vê dizane." Rast e. Herkes dizane, lê belê xuya ye ku hin ji me zêdetir dizanin. Lewre vê paşiyê hin nivîskarên me her diçe wateyên din lê zêde dikin.

Her diçe, em li gotinên wek **civata Kurdî, zimanê Kurdî, çanda Kurdî**, hwd. pirtir rast tên. Xuya ye van gotinan bi Enstîtuya Kurdî dest pê kirine û her çûye yê Kurdan bûne yê Kurdî, ango ên bi Kurdan re têkildar û ên bi zimên re têkildar tevlihev bûne. Heta niha carinan bala min dikişand, lê ez pirr li ser nedisekinim. Bes piştî ku min sernivîsa lêkolîneke birêz Mahmûd Lewendî dît: **Ala Kurdî** (Azadî, Hejmar 71; divê li vir bibêjim ku lêkolîna birêz Mahmûd Lewendî pirr di cih de ye û bi kêr e, ez sernivîsê mineqêşe dikim) û min hin gotinên din yê ku vê dawiyê bi "Kurdî" hatine çekirin jî anîn bîra xwe, ez lê hay bûm ku, hin nivîskarên me wateyeke din li Kurdî dikin. Çima gelo?

Ma ne heta niha me ji ala xwe re digot: Ala Kurdan an jî ala Kurdistanê. Her wiha ji ber rengên wê ji me jê re digot ala rengîn. Jixwe, di hebêst û nivîsarên ku nivîskar di eynî lêkolînê de bi kar anîne

de jî wiha tê gotin:

**"...Ala Kurdan, ji jor ber bi jêr ve, sor, sipî û kesk e, di nava wê de roj diçirise."** (ji Hewarê)

**"...Min postekê esker ji xortên nebezê Kurdan da çekirin, ala Kurdistanê serbixoyî re li qocên Agirî daçiçandin..."** (Ji Îhsan Nûrî)

**"...Ala Kurdan di nav rok**

**Çi bedew û bi heybet..."** (Ji Hawarê)

**"Ala Kurdan ser be ser**

**Sor û gewr e kesk û zer"** (Ji Hawarê)

Min binxet kirine(B.R.).

ke nû li Kurdî hatiye kirin.

Nasnameya Kurdî

Pirsa Kurdî

Zimanê Kurdî

Civata Kurdî (Ev her çar gotin min ji Medya Güneşi, Hejmar 35, wergirtin.)

Çanda Kurdî

Diyar e ku "Kurdî" li vir, ne wek nav, lê wek rengdêr (sfet) hatiye bikaranîn. Ango wek bi Îngilîzî "Kurdish". Gelo "Kurdî" bi tena xwe dikare gişa wateyên "Kurdish" hilgire. "Kurdish" sê wateyên bingehî hene:

a) Kurdî (Zimanê Kurdî)

b) Kurd.

c) Der heqê Kurdî/Kurdan de, bi Kurdî/Kurdan re eleqe-

ji van yekê hîlbijêre: Kurdish: a- Kurdî (ziman), b- Kurd (neteweyetî), c- yê Kurdan (derheqê Kurdan de, bi Kurdan re eleqedar, yê ku Kurd xwediyê wan e, hwd.).

Di Kurdî de, raweya xwedîtî karê rengdêran jî dike. Lewre yê/ ya/ yê Kurdan tenê nabe tiştê ku Kurd xwediyê wan e, ew her wiha tiştên ku min li jor di xala "c" de rêz kirin jî dide.

Îcar hek em di ronîya vê ravekirinê de li wan gotinan binêrin, divê wiha bin:

**Ala Kurdan**, Kurdistanê ne ala Kurdî

**Nasnameya Kurdan**, ne nasnameya Kurdî.

bibêje dersên zimanê Kurdî, jixwe Kurdî zimanê Kurdan e. Li vir pirsek heye ku ravekirina wê dikane pêşiya hin tevliheviyan bigire. Gelo mirov kengî "...Kurd", kengî "...Kurdan" bi kar diheine û tu cudatiyan çêdikin an na? Bê guman, cudatiyan çêdikin. Gava ku mirov bixwaze neteweyê şanî bide, "Kurd" bi kar tîne. Lê belê, ji bo ku mirov tiştê bi Kurdan re, ango bi gelê Kurd re, têkildar şanî dide, mirov Kurdan bi kar diheine. Ango Kurd netewetiyê şanî dide. Em dikanin vê bi çend mînakên rave bikin:

**Mamosteyê Kurd**-Mamosteyê Kurdan

**Bijîşkê Kurd**-Bijîşkê Kurdan

**Karmendê Kurd**-Karmendê Kurdan

Mamosteyê Kurd: "Ew kes mamoste ye û Kurd e". Mamosteyê Kurdan: "Ew ji Kurdan re mamostetiyê dike". Bijîşkê Kurd: "Ew bijîşk e û Kurd e". Bijîşkê Kurdan: "Ew ji Kurdan re bijîşkiyê dike" (dibe ku ne Kurd be). Karmendê Kurd: "Ew karmend û Kurd e" (ne pêwîst e ku ji Kurdan re karmendiyê dike). Karmendê Kurdan: "Ew ji Kurdan re karmendiyê dike" (ne pêwîst e ku Kurd be).

Mirov dikare "Kurdî" bi van yekan re bi kar bîne ku babet zelaltir dibe:

Mamosteyê Kurdî: "Ew dersên Kurdî dide" (ne pêwîst e ku Kurd be yan jî dersê bide Kurdan).

**Di Kurdî de, raweya xwedîtî karê rengdêran jî dike. Lewra yê/ ya/ yê Kurdan tenê nabe tiştê ku Kurd xwediyê wan e, ew her wiha tiştên ku min li jor di xala "c" de rêz kirin jî dide. Îcar heke em di ronîya vê ravekirinê de li wan gotinan binêrin, divê wiha bin: Ala Kurdan/ Kurdistanê ne ala Kurdî**

Îcar ji çavkanî yê lêkolînê jî xuya ye ku Kurdan jê re gotine ala Kurdan an jî ala Kurdistanê. Jixwe bi awayekî din jî nikane bibe; al an a gelê Kurd e, lewre ala Kurdan, an jî ya welatê Kurdan e, lewre ala Kurdistanê ye. Diyar e ku kes nabêje, al a zimanê Kurdan e û hek mirov bipirse, mirov dibêje ala kê? An jî ala kîjan welatî/ dewletê? Mirov nabêje, ala kîjan zimanî?

Li vir tenê tiştê dimîne. Mirov wateyeke din jî li "Kurdî" bike. Gava ku mirov gişa gotinên bi vî awayî dide ber hev, mirov dibîne ku wateye-

dar, ango yê Kurdan.

Ya ku van wateyan gişan dide, paşpirtika "-ish" e. Ew di peyvikên wek Turkish, English, hwd. de jî her wiha ye. Peyvikên bi vî rengî di hin zimanên din ên Ewropîyan de jî hene.

Di Kurdî de, paşpirtika "î" ku dikeve dawîya navê neteweyekî navekî çêdike, ew nav dibe zimanê wî neteweyî. Wek Tirk-Tirkî Erebe-Erebî, Îngilîz-Îngilîzî, hwd. Giş nav in, navên zimanan. Tu ji wan ne rengdêr in.

Ji ber vê yekê, divê di Kurdî de, li gorî naverokê, mirov

**Pirsa Kurdan**, ne pirsa Kurdî (hek mirov bibêje pirsa Kurdî, mebest dibe pirsa mezin).

**Çanda Kurdan**, ne çanda Kurdî.

**Civata Kurdan**, ne civata Kurdî.

Lê belê tiştên tenê bi zimên re eleqedar:

**Enstîtuya Kurdî** (hek ew bi kar û barê zimên mijûl dibe).

**Dengên Kurdî**

**Elfabeya Kurdî**

**Rêzimana Kurdî**

Dersa/ dersên Kurdî (wê gavê jî hewce tune ku mirov

Zahir Kayan

Pirtûkeke Gabar Çiyan bi navê "Ji kehniya şanoya Birîna Reş Êşa Zirav" derket. Ev pirtûk li Stockholmê di sala 1993 09 20' an de hatiye amadekirin. Gabar Çiyan di vê pirtûkê de, du şano nivîsine û ji bo van her du şanoyan jî pêşgotinek nivîsiye. Her wekî di pêşgotinê de Gabar Çiyan li ser rewşa şanoyê, rê û rêça şanoyê de hinek tespîten balkêş pêşkêşî xwendevanan kiriye. Li ser rol û rewşa şanoyê û cihê wê yê di nav jiyana gelê Kurd de bi hinek ramanên hemdem û nûjen li berê çavan raxistiye.

Gabar Çiyan di vê pirtûkê de du şano amade kirine, her du şano jî li ser rewşa Kurd û Kurdistanê hatine avakirin. Şanoya yekemîn bi navê "Gerîla" ya duwemîn "Gava agir bi daristanê dikeve" ye. Ev her du şano bi hêsanî jiyana gelekê bindest û psikolojiya wî tîne ziman. Gabar Çiyan di van şanoyan de li şer naverokeke herî girîng sekiniye, jiyaneke berbiçav û hemdem di van şanoyan de bersivandiyê. Jiyanê gelekê bindest di axaftin û kirinê wan de daye xuyan. Gava mirov van şanoya dixwîne, birîndariya gelê Kurd, qelsiyên wî, bêkesî û nezantiyên wî dibîne. Zulf û kotekiya ku li ser gelê Kurd didomin, bişaftin û talankirina li ser

gel, ji holêrakirina çand û toreyê xwe bi hêsanî didin der. Ew kesên ku di van şanoyan de diaxifin giş birîndariyên Kurdistanê tînine ziman. Ev kesdu celeb in: Hinekê wan serwest in, jî in, welatparêz in û şoreşger in; hinekê wan jî cehş in, xwefiroş in, xînzîzê welatê xwe û xwe ne. Gabar Çiyan ev dubendiya han bi rê û rêçeke xurt ve daye nîşankirin û li ser vê bingehê rastiya rîya tîkoşîna gelê Kurd nîrxandiyê. Di şanoya "Gerîla" de Gabar Çiyan hinek rastiyan balkêş bi hinek kesanetiyan ve daye xuyan. Di şanoyê de "mux-

tar", kesanetiya Kurdên xwefiroş û nezan dide beyankirin. Di şanoya

"Gerîla" de gerîlayek ji aliyên leşkeran ve bi şkenca tê şêhîtkirin. Serleşkerê qereqolê dixwaze malbata gerîla binase, ji bo wî karî m u x t a r ê gund roleke birakujiyê hildide ser xwe û li pey politîkayên neyara diçe. Bavê gerîla hildide tîne ba serleşkerê qereqolê. Bavê gerîla jî li gorî xwestina serleşker bersiva xwe dide: "Dewlet pirr mezin e, qefleyek cerdevan nikarin serî bi dewleta tirk

re derxin, kurê min bûye rêbir, bûye terorîst. Ên ku li dijî dewletê tîfing hilde û şer bike ew ne kurê min e." Ev gili li xweşa serleşker diçe û laşê kurê wî didine. Bavê gerîla paşê bi saya serê jina xwe û bi giliyên wê yî welatparêz tê rayê û rastiye dibîne. Di şanoya duwemîn de jî "Gava agir bi daristanê dikeve" de Gabar Çiyan bi navê "Simko" rewşa kesên nezan û kesanetiya kole dide xuyakirin. Di vê şanoyê de birayê Simko gerîla ye, lê Simko ditirse, diqehire, xwedî li birayê xwe yê gerîla demayê. Birayê wî şêhid dikeve, lê ew jî mal direve. Ji bo ku kes nebêje ew birayê wî ye. Jina Simko pirr welatparêz e û gelek hemdem difikire, her car li hember Simko tîdikosê û dixwaze wî bine li ser riye rast. Di dawiyê de Simko tê girtin û di girtîgehê de tê îşkencekirin. Paşê hinek rastiya dibîne û li rîya rast xwedî derdikeve.

Di van şanoyan de wisa tê xuyan ku gelê Kurd di tîkoşîna xwe de dikemile û xwedî li welatê xwe derdikeve. Di van şanoyan de hinek kes "Simko, bavê gerîla" di serî de xwe nenas in, li dijî tîkoşîna xwe ne; lê gava ku rûçikê neyarê xwe bi nêzik ve dibînin hêdî hêdî tîne guherîn. Gabar Çiyan hemû dubendiyan jiyanê gelê Kurd yê di şer û cengê de bi van şanoyan, bi axaftin û bi pêkanînan ve dide ber çavan.

## Êşa Zirav

GABAR ÇIYAN

"Ji kehniya şanoya Birîna Reş"

Êşa Zirav

Çand / Kultur



Kurte  
çîrok

# Ku mirim kesera min bixemilîn

M.Zahîr Kayan

Serê xwe rakir, xeweke westiyayî xwe avêtibû çavên wê; Kir ku rabe lê birîndar bû. Tenê bû. Di zinaran de şiqîfîbû, birînen wê gelek bûn. Dîsa hêz anî xwe ku rabe, birînen wê tu mecal nedidan, devê birînan wek şeftan bi awayî çem û kaniyan xwîn dirjandin. Lê ewê rabûya, ji cihê xwe qil kir, bi axî di nav teht û kevîran de derket xwe berda nava hêşnahiyê. Westiyabû. Çavên reş dikir ku xwe bi avêjin xewneke bêrabûn; lê wê li ber xwe dida. Nedihîşt ku mirin li hember jiyane serfiraz bibe. Di sê çar cihên xwe de birîndar bû, her birîn êşeke giran lê çêdikir. Dema xwe avête nav hêşnahiyê kulîlk û sosinan bi dilekî geş xwe li ber piyên vê keçikê raxistin. Ji kulîlk û sosinan emeniyêke xweş çêbû. Ji birînan xwîn dikişiya, wê xwe bi keleşkovê girt ji kincên xwe hinek qetand, li birînan pêça û dû re bêhemd ket. Av dikişiyên lê ew raza bû, baran barî, qeflên qulîngan hatin û derbas bûn ew hê razayîbû, heyv û stêrk derketin û qala Leyl û Mecnûn kirin, dengê bombeyên neyar dihatin, ew dîsa razayîbû. Dema rabû berê sibehê bû, ronahiyeke pîroz xwe li çiyayên Agirî, di ser zozanan re berda bû. Av bi xule xul dikişiyên û bi lêdana tîrêjên rojê wek kevîrê bi qîmet dityayîn. Sibehê Gulanê li serê çiyayên bi nav û deng li Serhedê dest pê dikir.

Birînen wê sar bûbûn, geh diêşiyên û geh tîr didan. Bi diwarî rabû ser xwe li erdê pelîşî û destê xwe avête berîka xwe kîsîkek derxist. Bi dilîniyeke mezin kîsik vekir û jê wêneyek derxist lê mêze kir. Bi çavekî westiyayî û bi dilekî şikestî...Li wêne mîzekir. Hûr hûr giriya. Wek baranên Serhedê li ser wêne xwar bûn hêstirên wê yek bi yek. Bi sewteke girîn û ricif got: "Gelo ez dê îcar ji te bibînim" Di wêneyê de hevalêkî wê û zozanên Kurdistanê dihatin xuyan. Zozan bi hezar kulîlk û sosinan xemilîbûn, xort yek bi dilê xwe dikeniya. Destê xwe bi îşareta serfiraziyê bilindkiribû, di destê wî yên din de keleşkovê hebû. Bi girîn: "Ji mirinê tu car natîrsim, lê dixwazim ku mirin tu car ber bi min ve neyê. Mirin min ji hevalên min, ji Kurdistanê rengîn, ji tîkoşîna şoreşê dûr dixê, diqetîne, nahêle ez bi Kurdistanê xwe şa bibim" Li ser pîsta wêneyê nivîsek hebû: "Ey Rojda, ey keçika çiyayên weletê bindest. Ez Xemgîn, ez heval û dilsozê te. Serê me ji bo welat, ji bo azadiya hemû gelên bindest. Dibe roj were em ji welatekî azad û serbixwe bi destê xwe bixin, wê demê hinek daxwazên min wê li te hebin. Ezê porê te yê dirêj û wek qîr û qetran maçî bikim, li rûyên xwe bixim wan tîlên pîroz. Lê ezê ew destên te yên narîn ku keleşkovê bi gernasî hildidin yek bi dilê xwe ziyaret bikim. Ezê bi sehera sibehê re, di hembêza van çiyên de destê te bigirim û

**B**irînen wê sar bûbûn, geh diêşiyên û geh tîr didan. Bi diwarî rabû ser xwe li erdê pelîşî û destê xwe avête berîka xwe kîsîkek derxist. Bi dilîniyeke mezin kîsik vekir û jê wêneyek derxist lê mêze kir. Bi çavekî westiyayî û bi dilekî şikestî...Li wêne mîzekir. Hûr hûr giriya. Wek baranên Serhedê li ser wêne xwar bûn hêstirên wê yek bi yek.

ji hemû cîhanê re bang bikim û bibêjim: "Êdî welatê min, ez û Rojdaya xwe em rizgar in. Emê bêtirs û bêminet li her derê welatê xwe bimeşin, dîlana me wê heta hetayê bidome. Ez li te silav dikim keçikê, şerê te û yê me hemûyan pîroz be..."

Rojda bi girîn wêne xiste kîsik, kîsik avête berîka xwe û serê xwe rakir. Dengê agirên bombe û balefiran dihat guhên wê, kir ku rabe here şer, lê birîndar bû. Êşê birînan mecal jê standibûn. Porên wê li ber bayê çep wek daristanên tropîkal pêl bi pêl weldigeriyan, tevlihev dibûn. Sifetên sor hêstir û xwêdan li ser erdê xwe dişiqitand. Digot: "Mirin çavê te kor bin tu çiqas sar î..." Lê dizanibû ku wê bimire, re-



şayî xwe dida ber çavên wê, destê wê pûç dibûn. Radibû ser piyên xwe, hinek bi rê ve diçû û diket, dîsa radibû lê dîsa li erdê wer dibû. Kevir û kuçik giş bi xwîna Rojdayê ya pîroz ve sor xemilîbûn. Av şiv bi şiv xwîn dikişiya. Westiyabû. Li ber kevîrê ket û serê wê ber bi asîman rabû û çavên wê yên wek zeytûn asîmanên Kurdistanê dîtin. Li jor qulîng difirîn. Ewr wek belekiyên berfê, wek keleşka dilîniyê di hembêza asîmanan de dişiqitîn. Wê hemû heval û dostên xwe anî bêriya xwe. Biçûktîya xwe, leyistik û nazên xwe xeyal kir yek bi yek. Evîndariya xwe, şer û cengê xwe; lê wisa ji wistuxwariya welatê xwe anî bêriya xwe. Wê demê dengê li ser ket, çavê xwe li

wî aliyê gerand, bala xwe dayê wek sed leşkerî ber bi wê tî. Bi ken dihatin, bi hovîti û bi barbarî. Dixwestin ku Rojdayê bi saxî bixine destê xwe.

Lê Rojdayê ev nepejirand. Rabû li ser çokên xwe sekinî, destê xwe avête keleşkova xwe û agir kir. Ji wan leşkeran çend heb kuştin, lê neyar Rojda dan ber gulean, bedena wê wek serad û bêjing qul qulî kirin. Ketine bîrîkên wê û wêneyên wê derxistin, şewitandin.

Colek avêtin navtenga wê û bi panzerê ve kişandin, anîn avêtine nava gund. Keçikeke piçûk revî hate ser laşê wê bi girîn got: "Heka Rojda tu bawer bike ez nahêlim roja te vemire, ez nahêlim roja te di tariyê de bimîne."

## Diya Ciwan û Pêlek ji deryaya kovanên min

Fener Rojbiyanî

Em gişt dizanin ku di berbanga dîrokê de dema admîzat dest bi nivîsê kir û ji bo mirovatiyê nivîsên cur be cur pêşkêş kir, pêşî nivîs li ser diwarên şeftan, li ser postikên mihan, li ser pelên berdî lê me qet nebihist ku, li ser pêlên derya û der barê wê de hatine nivîsîn û tu agahdarî ji negihîştine me.

Di vê dema dawî de xwişka me, Diya Ciwan, qîza Botanê li ser pêlên deryaya kovanên xwe nivisandiyê û Bavê Narîn jê re pêşgotinekê nivîsiye. Pêlên wê ji, bi wêneyên Jiyan Şûzî ve hatiye xemilandin.

Nivîskar derd û kulên xwe bi xwendevanan dide nasîn. Diya Ciwan wek: Mestûre Erdelanî, Jîla Huseyn, Nesrîn Fexrî, Rewşen Bedirxan, Kurdistan Mukriyanî, Serfiraz Neqîşbendî û hwd. ji ber rewşa afreta Kurd a ne baş û rewşa welatê xwe ya bindest û perîşan dil bi kul, xem û kovan bû. Bi pêlên xemxwariyê dilê wê dagirtiye. Pêl keliya...Serê xwe rakir, li dor nihêrî û bi vîneke tund, bi ramanêke rast û bi sincekî bilind xwe di ser tehtan re hilavêt. Xwe gihande rexê din. Ranewestiya, her bi pêş ve çû. Li ser qadeke nû lingê xwe danî û her nasîbû ku dermanê dara hişt av e. Dermanê birçiyên ji nan e. Ên girtiyan tavek e, avakirina malekê ji xebat û kar e. Û çiya ji yên



bindest re alîkar e:

Ey çiya

Ez di bextê te de me ey çiya, va ye dîsa sêwiyên te berê xwe dane sînga te/ Ey çiya... Ji daran re bibêje bila îsal zû pel bidin ji bo wan./ Ji çavên bombeyan biparêze/ Bibêje berfê, bila zû bihele. Ji bo piyên wan ên xas di nav de netevizin/ Bibêje teht û latan...Tû-tîrk û dare striyan bila dilovan bin, li wan gozikên wan î tazi/ Di bextê te de me ey çiya...Sêwiyên bi germî hembêz bike...Ji ser ku xweş dizanim ji te pê ve

kesî wan nîn e.

Di pirtûka xwe de Diya ciwan dergeheke nû di toreyê Kurdî ya nûjen de vekir û cureyêke nivîsa jîbîrkirî ji nû ve vejand. Ew bîrhatin, bîrewerî (xatire) ne. Di vî warî de roj bi roj xwe peyitand (îspat kir) û dide pêşiya xwendevanên Kurd. Her wiha Diya Ciwan dibêje ku, "Toreyê Kurdî ne tenê helbest, çîrok û roman in. Lê divê dirûveke nû ji toreyê re bête vejandin." Dixwaze ku derd û hêviyên xwe bi şewekî bîrewerî û bi awayekî serketî bête nivîsandin:

Zayîn

Ey kehnîyên zîwabûyî ji tînan.../ Ey şaxên qurmîçandî.../ Ey kulîlkên bihara jîbîrkirî/ Ey şeftên kul û derdan/ Ey çiyayên bîxew...Diya e îro dîrokek derew dilerize./ Pêlên wê yên rizî diwerihin./ Ji ber ku îro...Zayîn nuh e...Jiyaneke nuh e./ Ji lew re pêdiviyê ku îro...Dîrokek nuh bête danîn.

Der mafê kaniya jînê de Diya Ciwan herî fireh û bi aram e. Dayîk pirtûka xwe dike diyarî ji wan dayikan re, yên ku her roj bi zolîkên kezêba xwe birînen welat pîne dikin. Ciwan, "Ez çiqas binivîsînim, çiqas pesnê te bidim ne bes e. Di ferhengên de li peyveke digirim ku qedr û qîmeta te bide, lê mixabin min nedît" dibêje me.

Sernameya jiyanê

Gazindan ji min neke, dayê. dixwazim pesna te bidim./ Lê gotin hemî

bêbuha ne...Çendî li tîpan digirim tev fedîkar û wînda ne.../Ma ez dikarim çi bibêjim. Cîhan ji te dest pê dike, navê te bi xwe jiyan e.

Diya Ciwan keça devera Mem û Zînê ya ku welatê xwe bi darê zorê berda û dibêje: "Axa welat qet nayê jîbîrkirin, dê çawa ji bîra me herê? Listikên berê, goz û behîvan ên ku me ji zeviyan didizî, nêçîra çivîkan, li ser bêderan cercerok bi me diçî dê çawa emê rojên han ji bir bikin."

Ji bo welat ji wiha dibêje:

"Bo welat

Pênûsa ku ji bo welatê min nenivîsi-ne bila bişkê/ zîmanê ku ji bo welatê min nepeyive bila jê bibe/ çavê ku rewşa welatê min nebîne bila kor bibe/ Guhê ku nalîna welatê min nebihiye bila kerr bibe/ zendê ku ji bo welatê min neheje bila qop bibe/ lingê ku ji bo welatê min nemeşe bila kût bibe/ Hişê ku ji bo welatê min neponije bila biqerise û bila gēj bibe/ Xwîna ku ji bo welatê min pêl nede bila ziwa bibe/ Dilê ku ji evîna welatê min nebe agir bila raweste û bimire/ bi kurtî mirovê ku ne ji bo welat be bila tune be."

Pirtûka Diya Ciwan "Pêlek ji deryayê kovanên min" ji 31 bîrhatiyên pêk hatiye û di 93 rûpelan de li Şamê çap bûye. Dimîne ku em bibêjin Diya Ciwan yekemîn nivîskar e li başûrê rojavayê Kurdistanê di warê nivîsandina bîrhatan de.



Çend gotin li ser îxaneta dîrokî (1)

# Partiya Demokratî Kurdistan û birakuji

C. Zûdayî

Di şerê rizgariyê de cihekî girîng ê 1993'yan heye. Lewre komara Tirk (KT) bi hemû îmkânên xwe yên aborî, leşkerî, siyasî û propagandayî ve li hemberî gelê Kurdistanê kete êrişê. Piştî Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan bi yek alî ji bo safkirina pîrsgirêka Kurdistanê 83 rojan şer da sekinandin. KT êrişên xwe berfireh kirin. Bi operasyonên 50-60 hezar leşkerî û bi bombekirina şaristanê Kurdistanê ji tu encam bi dest nexist. Bervajiyê wê ARGK'ê hêza xwe hîn mezin kir, derbên mezin ji li KT'ê da. Dewleta Tirk ji li hemberî gelê teror û qetlîam meşandin, bi sedan gund şewitandin. Li gel vê yekê gel xwe neda paş, li dor artêşa xwe kom bû û mecalên xebatên siyasî û diplomatîk zêdetir bûn. Lê xwe li dijî van xebatan negirtin û li Batmanê mebus Mehmet Sincar kuştin. Li ser DEP'ê êrişên xwe berdewam kirin, bi hinceteke basît Yaşar Kaya avêtin zindanê. Li ser çapemeniya demokrat û aza pestên xwe hîn bêhtir domandin. Kuştina rojnamevan û zordestiyê li ser Özgür Gündem, Welat û hwd. nîmûnê ve rewşê ne.

Serleşkerê Tirk Doğan Güreş bi şeweyekî eşkere gelê Kurd bi teror û qetlîamê tehdît kir û gote ku, heta biharê wê koka PKK'ê biqelînin. Ji her aliyê ve cerdên xwe domandin. Ji wan êrişan yek jê operasyonên meha Cotmehê ne ku, ji 40 hezarî bêtir leşker û çehşên xayîn ve tevî pêşmergeyên PDK-Iraqê ve li başûrê Kurdistanê girtin ser bargêh (kamp) ên PKK'ê. PDK careke din îspat kir ku ji riya îxanetê venagere.

Niha KT çi metodan pêk bîne, tê fêmkirin. Em dixwazin li ser PDK-I'yê bisekinin. Armançên wan çi ne? Gelo di van êrişan de mafê gelê Kurd heye? Li gel artêşa Tirk êrişên wan tê çi maneyê? Pêwîst e ku ev pîrs bîne bersivandin.

Ji bo çi Armançî ewqas kirin?

Berî her tiştî KT li hember a-zadiya gelê me êrişên mayîn û nemayîne berdewam dike. Bi artêşeke wisa re beşdarbûna operasyonan rûçikê PDK'ê eşkere dike û bêveşartin îxaneta wan dide îspatkirin. Ji bo vê yekê pêwîstî bi lêkolînan ji nîn e. Lê divê mirov li dîroka PDK'ê binêre. PDK bûye birîneke reş û ketiyê dilê Kurdistanê. Bûye xencereke zenggirtî di dilê Kurdistanê de. Ne ku li dijî PKK'ê tenê îxanet kiriye. Na, li hemberî hêzên pêşverû

**PDK** li Başûr li dijî hemû hêzan şer kiriye. Hîn di sala 1964'an de ku di nav wan de bi serokatiya İbrahim Ehmed tevgerêke radîkal serî hilda PDK'ê dest bi birakujiyê kir. Bizav hîn li ser hîmê xwe rûnenîştibû, ji ber êrişên PDK'ê di sala 66'an de xwe teslimî rejîma faşîst a Bexdayê kir. Bingeşa YNK'ê ku ji wir tê ji wê demê û ta niha di nav wan û PDK'ê de şer çêbûye. Di nav wan de bi hezaran welatparêz hatine kuştin.

yên welatparêz û demokratên Kurdistanê hemûyan şer kiriye. Bi destê dewletên kolonyalist gelek kesên welatparêz û şoreşger kuştîye û bûye sebeb ku hêzên radîkal dernekevin. Di herêmê de di destên dewletên faşîst û împeryalist de bûye şûrekî duserî.

Her wiha bûye sebebê têkçûn û şkestinên tevgerên Başûr jî. Di şkestina 75, 88 û 91'an de rola PDK'ê esas bûye. Di van têkçûnan de bi sed-hezaran Kurd hatin kuştin û qirkirin. Bes di sala 88'an de 184 hezar Kurd hatin kuştin.

MAŞIKA DI DESTAN DE

PDK li Başûr li dijî hemû hêzan şer kiriye. Hîn di sala 1964'an de ku di nav wan de bi serokatiya İbrahim Ehmed tevgerêke radîkal serî hilda PDK'ê dest bi birakujiyê kir. Bizav hîn li ser hîmê xwe rûnenîştibû, ji ber êrişên PDK'ê di sala 66'an de xwe teslimî rejîma faşîst a Bexdayê kir. Bingeşa YNK'ê ku ji wir tê ji wê demê û ta niha di nav wan û PDK'ê de şer çêbûye. Di nav wan de bi hezaran welatparêz hatine kuştin.

Li hemberî hêzên din yên Başûr jî PDK pesta xwe her domandîye. PDK li hemberî PK-I (Partiya Komînist a Iraqê) û gelek hêzên din şer kiriye. Bûye sebebê ku di nava hêzan de yekîti çênebin. Demên ku rejîma Bexdayê zeyîf ketiye, şerên birakujiyê bi destê PDK'ê li Başûr bi pêş ve çûne.

Ev xeysiyetên Başûr li parçeyê Başûrê Rojava (Sûrî) jî hatiye domandin. Di vî parçeyî de ji di nava gel de yekîti û îtiqaq çênebûn.

PDK'ê li hemberî hêzên Rojhilat jî îxanetêke mezin pêk aniye. Heke tevgera Kurdên Rojhilat qels mabe, sebebê jê PDK ye. Piştî rûxandina Komara Mehabadê hereket zeyîf ket û di bin rejîma faşîst a Şah de demeke dirêj xwe neda hev. Di salên 1960'an de ji nû ve tevger xwe livand. Lê destê îxanetê zû xwe gihande wan. Di sala 1969'an de Serokê PDK

Îranê Sileyman Muînî bi destê pêşmergeyên PDK'a Iraqê hate dîlgirtin, ew kuştin û laşê wî ji Şahê Îranê re hate pêşkêşkirin. Li gel Sileyman Muînî gelek endam û rayedarên PDK'a Îranê jî hatin kuştin û dîlgirtin. Ew ji teslimî Îranê kirin ku çend kes ji wan endamên Komîteya Navendî bûn. Rejîma Îranê laşê Sileyman Muînî bi rojan li bajarên Kurdistan ji bo çavtirsandina gel gerandin. Ev wehşet ji hêla PDK'ê ve hatibû kirin û bû sebeb ku Kurdên Îranê careke din piştî xwe rast nekin.

Di dawîya 1979'an de piştî ku rejîma Şah rûxiya, Îmam Xumeynî desthilatê xiste destê xwe. Di pey rûxîna desthilata monarşiyê de Kurd careke din serî rakirin. Her çiqas PDK'a Îranê ji bo serokatiya gel ne amade bû jî, rojhilata Kurdistanê ji dagirkeran paqij kirin. Pêvajoya salekê tu hikmê Komara Îslamî li rojhilatê Kurdistanê nemabû. Careke din PDK'a Iraqê xwe gihande rejîma Îslamî, kete pêşiya pasdarên wan û gav bi gav gund û bajarên Rojhilat ketê destê rejîma Xumeynî. Bi pêşengiya PDK'a Iraqê, pasdar û pêşmerge gelê Kurd di qetlîaman re derbas kirin. Bes li bajarê Şîno 2 hezar zar, pîr û kal, xort û keç hatin qirkirin. Bi vî cureyî tevgera rojhilatê Kurdistanê şikestin xwar û heta roja îro nehatiye ser hişê xwe.

Ev jî ne bes bû. Ji bihara 93'yan bi vir ve, li nav axa başûrê welêt operasyonên xwe li hemberî PDK-Îran û mihacirên Îranê didomîne. Li herêmên Silêmaniye û Hewlêrê li ser ti xûb bi deh hezaran malbat hatine koçkirin.

Ev bûyerên bi kurtî hatin ziman xweş didin îspatkirin ku PDK di destê rejîmên Îranê de tim bûye hacetek û li hember tevgerên Kurd ên Îranê hatiye bikaranîn. Ji ber êrişên PDK'ê Kurdên Îranê ji nav xwe tevgerên radîkal demexistiye.

PEYAYATIVINGÊ YA XELKÊ

PDK li hember bizavên bakurê Kurdistanê jî, di destê re-



Mele Mustafa Berzani



İbrahim Ehmed

jîmên Tirkiyeyê de bûye wek hacetek. Ne ku îro li dijî PKK'ê şer dike, hîn beriya ku PKK derkeve li hemberî hêzên welatparêz gunehkariyên mezin kirine. Di dawîya salên 1960'i de bi navê PDK-T bingehê hêzên welatparêz hatibû avêtin. Lê belê serokên vê tevgerê hîn di serî de ji aliyê hêzên tarî ve hatin kuştin.

Piştî kuştina Faîk Bûcak komplo nesekîn. Di sala 1971'i de li başûrê Kurdistanê bi komployan PDK-I du rêberên PDK-T'yê hatin kuştin Dr. Şivan (Saît Kirmizitoprak) û Saît Elçî. Piştî kuştina herdu rêberên PDK-T'yê partî xwe neda hev. Bi destê MÎT'a Tirkiyeyê komplo hatin berdewamkirin. Muhterem Biçimli û Edîp Karahan bi awayekî tarî ji navê hatin rakirin. PDK-T bi tevayî kete destê MÎT'ê. Wek tê zanîn di salên 1980'yan de li hember PKK'ê bingehê bi navê UDG êrişêke tevahî li herêmên Mêrdîn, Batman û Amedê çêbûn ku di van êrişan de nêzikî 50 welatparêz û şoreşger hatin şehîdkirin. Sebebên van îro hîn bêhtir tê fêmkirin û di mehkemeyên Diyarbakirê de gelek heqîqet hatine ronîkirin ku serkêşêvan tev-

lîheviyan PDK ye. Rola Samî Abdurrahman di wan de xweş tê zanîn ku di wan deman de Serokê PDK-I'yê bûye.

EV RASTÎ ÇIMA DERENG DERKETIN?

Di vê dîroka kurt de PDK li her parçeyên Kurdistanê ji bo mafên xwe yên şexsî, eşîrî û bi taybetî ji bo mafên malbatên xwe di destê dijmin de û di destê rêxistinên îstîxbaratan de wek MÎT, CIA, MOSSAD û SAWAK'ê tim bûye hacet û şerên birakujiyê, şikestinxwariya tevgerên Kurdan û qelsketina wan.

Gelo çima ev heqîqet heta niha nehatine dîtin? An jî ta niha çawa îxaneta xwe domandîne? Ev ji parçebûyîna Kurdistanê ye, a duduyan ji paşvema-yîna gelê Kurd e û a sisiyan ji berdewamkirina tîkiliyên eşîrî û feodaliyê ye, a çaran jî di parçeyên Kurdistanê de tevger û serokatiyê hemdemî û modern derneketiye û ji daxwazên gel re nebûye bersiv. Ev niqteyên esas mecal daye ku PDK emrê xwe ta îro berdewam bike

Wê bidome

## Nîşana demokrasiya Tirk

Demokrasiya dewleta Tirk rûçikê xwe yî rasteqîn dîsa diyar kir. Ji pirtûkên Dr. İsmail Beşikçi re jî baristaniya wan nîn e. bi qanûnên derî mirovahiyê dixwaze bîr û ramanê qedexê bike. Girtina Mamoste Beşikçi nîşana çawaniya demokrasiya Tirk e.

Em endamên NÇM'ê Koma Çiya, Koma Amed, Koma Rojhilat, Koma Mezrabotan, Koma Azad, Koma Serhildan a Govendê, Şar-... Jiyana Nû, Ozan Xanemîr, Ozan Ganî Nar û Gulên Mezrabotan ev biryara ku li dijî demokrasiyê ye hatiye dayîn protesto dikin û dibêjin dile me, hizr û ramanên me bi Mamosteyê me re ye û wê bîr baweriyên wî her tim di nav gelê Kurd de bijîn.



*Hevpeyvînek bi Bavê Nazê re li ser romana Kurdî*

# Ez nikarim bibêjim ku romana Kurdî heye

Hûn çîroka dirêj û romana Kurdî di kîjan qonaxî de dibînin, berhemên nivîskarên din ên di wî warî de çawa dibînin û dinirxînin?

—Yek ji wan sebeban ku dihêle zimanê min kin be ew e ku, ez hem çîrokan dinivîsim û hem jî bi pîşeya xwe yê fermî rexnegîr im. Min doktora xwe, weke mirovekî lîteraturnas (wêjenas) qedandiye. Babeta karê min jî divê ev yek be.

Mixabin ew berhemên wêjeyî ên ku heta îro hene, ez dixwazim hinekan jî bi nav bikim, dibe ku ez hinekan biêşînim ev ne sûcê min e, sûcê wan e. Wan bi xwe, xwe êşandiye. Ji ber ku wan bi van rengan nivîsiye. Emê bibêjin, ew romanên ku **Mehmet Uzun** dibêje: “Roman in”, heta niha 4 roman nivîsandine û min ji wan sisyan xwendine, tenê min ya dawî nexwendiyê, ji ber ku bi destê min neketiye. Dîsa min kurteçîrokên **Fîrat Cewerî**, çîrokên **Mahmut Baksî**, hinek çîrokên **M.Emîn Bozarslan** û pirtûka ku vê dawiyê derketiye ya **Lokman Polat** û hinekên din jî, yên ku niha nayêne bîra min, min tevî xwendine.

Di wî warî de gelek caran semîner, danûstandin çêbûne, min tim baweriya xwe vekirî gotiye. Mixabin heta roja îro ez nikarim bibêjim ku romana Kurdî heye. Berhemên me yên ku heta îro, tevî yên ku li derveyî welat hatine nivîsin jî, bi sewiyeya xwe gelekî nizm in. Nizm in di warê honandina hunerî de, nizm in di warê naverok û fikra xwe de, nizm in di warê lawaziya zimanê xwe de.

Di warê disîplîna roman-nivîsînê de çawa nin?

—Jixwe dema ez dibêjim honandina hunerî, mebesta min zanebûna teknîka nivîsandina roman û çîrokan e. Ji ber vê yekê, dema berhemeke wêjeyî bi naveroka xwe qels be, forma xwe ya wêjeyî tune be û bi zimanê xwe jî zeyîf be —di warê ziman de dixwazim bibêjim ku nivîsên **Fîrat Cewerî**, jî yên **M. Uzun**, **Baksî** û **Polat** çêtir in— yanî berhemek eger di hersê rîknên xwe yên cewherî de wiha be, mirov êdî nikare binirxîne, ji ber ku tune ye. heta sewiyeya wê hebe.

Helbet mirov nikare hikum bike, bibêje. “Tune û qediya”. Na. Divê mirov bibêje çima tune. Eger mecal hebûya, min ê bixwesta yek bi yek li ser wan rawestyama û rastiya wan danîba holê.

Eger pêwisti hebe ez dikarim li ser çendekan rawestim.


**M**ixabin heta roja îro ez nikarim bibêjim ku romana Kurdî heye. Berhemên me yên ku heta îro, tevî yên ku li derveyî welat hatine nivîsin jî, bi sewiyeya xwe gelekî nizm in. Nizm in di warê honandina hunerî de, nizm in di warê naverok û fikra xwe de, nizm in di warê lawaziya zimanê xwe de.

*Bavê Nazê! Tu dixwazî were em li ser romana M. Uzun “Siya Evîne” rawestim. Li gor van pîvan û xalên we nîşan dan.*

—M. Uzun dema romana xwe ya “**Tu**” dibe serî û dest bi romana duyemîn dike, tişteki wêjeyî heye, ew jî yek ji bingeheên nivîsandina romanê ye, jê re dibêjin: “Çarçoveya wêjeyî”. Yanî naskirina xwendevanan bi lehengên nivîskar re. Nimûne, dema ez dest bi nivîsîna romanê dikim û navê lehengekî bi min re derbas dibe, ez wî lehengî bi xwendevanan didim naskirin ku ew ji ku derê ji min re hat. Mehmet Uzun dema dest bi romana xwe ya duyemîn “**Mirîna Kalekî Rind**” dike, ji xwe re bi hêsanî dibîne ku xwendevan gerekê zanibe ew berdevama pirtûka wî ya yekemîn e. Yanî bêbingeh M. Uzun dixwaze xwe îqna bike ku tişteki gelekî normal e, lehengê wî jî zindane derketiye, daketiye Binxetê û dixwaze here Ewropayê. Eger ez ne şaş bim, navê lehengê wî Serdar e. Ez vê yekê qebûl nakim.

Berî her tiştî “**Mirîna Kalekî Rind**” ne berdevama “**Tu**” ye. Di warê honandina hunerî de, ew pira ku wan herdu pirtûkan bi hev ve girê dide ava nekiriye. Ji ber wê yekê ne-mimkûn e mirov bikaribe qebûl bike.

Di “**Mirîna Kalekî Rind**” de, dixwaze bi xwendevan bide qebûl kirin ku ew kalekî bi seyr e û gelek tiştên veşarî di bin wî de hene, di tûrikê wî de gelek tişt hene. Ew kalê ku ji destpêka vê sedsalê gihîştîye 1970’yan. Xwendevan radiweste ka wê kalekî wiha çî di bin de hebe. Û ewqas çûn û hatinên Serdar ji Ewropayê ku diçe cem wî kalî, di dawiya dawiyê de xuya dike ku tişteki li ba wî Kalî tune ye. Tenê ew defterên ku wî kalî jê re hişti-



*Bavê Nazê berê bi Erebi dinivîsand*

bûn bi xwe re tîne û vedigere Ewropayê.

Di dawiyê de jî eger xwendevan nizanibe ka ew çî nivîsandin bûn, ew çî defter bûn Serdar bi xwe re anîn, wê çaxê ew Kal derew e, tu nivîsandin û defter jî li holê tune ne. Bi gotineke din mirovekî romannivîs, romana xwe bi pêşgotinekê dest pê dike. **Tolstoy** romana xwe “**Ana Karanîna**” bi pêşgotineke du-sê hevokan dest pê dike. Pêşgotina Tolstoy baş nayê bîra min. Lê hema ez dibêjim-wiha ye: “Mirovên bextiyar, tev wek hev bextiyar in û yên ne bextiyar jî gişt wek hev in. Û di malbata filankes de, her tişt çû tevlihev bû.” Ev çend hevok pêşgotina romana Tolstoy ya hêja û binirx e.

Dema di warê honandina wêjeyî de, bala xwe bidî romana “**Mirîna Kalekî Rind**” xuya dike ku, bi objektîvî tev bûye pêşgotina wê pirtûka ku gerek bû M. Uzun binivîsanda, lê ne-nivîsandiye. Dibe ku mirovek 150-160 rûpelan binivîse û ewqasî zoriyê bide xwendevan û dawî xuya bibe ku di tûrikê Kalo de tişteki tune. Bi tu awayî ev nayê qebûl kirin. Ew dikare her tişt be, lê tu girêdana wê bi roman û wêjeya Kurdî re tune ye.

Gelek tiştên din jî hene, nayêne hejmartin ew şaşî û bêdisîplîniya nivîsê. Nimûne, heta ez navê lehengekî xwe peyda dikim, ez gelekî xwe diêşînim, digirim û digirim, çima? Ji ber ku dema temenê lehengê min 40-50 sal be û ez navê wî bikim Azad, Şoreş û hwd. wê çaxê ez derewan dikim. Ji ber ku dema ev nav li mirovan werin kirin, ev nîşana qonaxê siyasî ya pêşketî ye. Navê wî wê Mihemed be, Abdullah be, Husên be, ev realîteya jiyana me ye. Îro dema zarokên me çêdibin, béguman ev nav li wan tîne kirin. De-

ma ez navê lehengê xwe bêxim Serdan, Şoreş û hwd. gereke ez bibêjim çima. Min di “**Stocholmê te çi ditiye bêje**” de, navê lehengê xwe kiriye Bêkes, lê min gotiye ku navê wî yê rast Mistefa ye. Bi vê yekê jî xuya dibe ku dagirker nahêlin Kurd navên bi Kurdî li xwe bikin, mirovên aktîv xebatê jî dikin bi navên kod ve dixebitin. Ev rastiya jiyana me ye. Di van pirsan de jî nabe nivîskar derewan bike. Dema navê leheng yê rast Serdar be, wê çaxê tê fêmkirin ku dewleta Tirk qebûl dikir ku, Kurd navên bi Kurdî li xwe bikin. Dêmek navê wî ne Serdar e tişteki din e.

Dîsa, dema ku ew lehengê xwe di sînor re derbas dike, dibêje ku, li ser sînor gihîştîye cihê ku bombe û cendirme lê hene, qonaxa mirin an jiyane, guleke sor hilgirtiye û ew gul jî aniye di quncika mala xwe de li Stocholmê daniye û nîşanî mirovan dide. Ev derew e. Ez benî, gava M. Uzun bihiştî ku Serdar berbejna diya xwe bi xwe re baniya û diya wî bigotayê, “Here kurê min wê ev berbejn te ji mirinê biparêze, gulayên li te bikevin wê bike pel û tu pê nayê kuştin” ew rastiya jiyane bû.

Tê bîra min, dema min romana xwe “**Çiyayên bi xwînê avdayî**” dinivîsand, min parçeyek ji hevalekî xwe re xwend. Dema Çeto li serê çiya ye, bi tena xwe ye, li benda Gulê ye. Radibe qevdek kulîlk dide hev û dide pişt xwe û dema Gulê tê diyariyê wê dike. Li vir bû tiqe tiqa kenê hevalê min û got: “Bavê Nazê, tu dibêji qey Çeto li Moskovayê li Meydana Sor û li benda hevala xwe qîzika Rûs e, wê qevdek gul diyariyê wê bike. Ne rast e, ni mimkûn e Çeto kulîlkan bide Gulê li ser çiyayên Kurdistanê?”. Ez rabûm min ew parçe ji romanê

**T**olstoy dibêje ku, sê rîknên romanê yên bingeheên hene. Naverok, form û rastego. Eger tu bipirsî kîjan yê herî girîng e, ezê bibêjim rastego. Cihê mixabinê ye ku di berhemên me yên li Ewropayê hatine nivîsin de rastego tune. Ji ber vê yekê jî berhemên wiha ne ku mirov nikare bibêje hene.

derxist.

Tolstoy dibêje ku, sê rîknên romanê yên bingeheên hene. Naverok, form û rastego. Eger tu bipirsî kîjan yê herî girîng e, ezê bibêjim rastego.

Cihê mixabinê ye ku di berhemên me yên li Ewropayê hatine nivîsin de rastego tune. Ji ber vê yekê jî berhemên wiha ne ku mirov nikare bibêje hene.

—Ez bixwe li wê meseleya Gulê û çend cihên din jî he ne wiha dinihêrim. Ew tişt ji aliyê M. Uzun ve karûbarekî binkevî ye ku dixwaze bi wê yekê Kurdan li ber çavê Ewropîyan şîrîn bikke û bibêje vaye em jî, ji gulên, hehecikan û hwd. hez dikin. M. Uzun jî bîr dike ku rojê sed bombe diteqiyên û rojê hezar cure teyr dihatin kuştin, daristan, bax û baxçe dihatin şewitandin.

Tiştê M. Uzun di wê romanê de dike, bi wan tiştan parastineke pasîv e di ber şexsiyeta Kurdan de.

—Rast e, jixwe dema ku Serdar û Kalikê xwê ji ber hehecikan ku baskê wê şikestîye çend mehan dimînin û bi malê re naçin zozanan, ji bo ku baskê wê sax bibe û bi firê keve. Di wî warî de jî pirs ji M. Uzun hate kirin. M. Uzun dibêje: “Min ne ji bo Kurdan nivîsiye, min ji bo Ewropîyan nivîsiye”. Ez fêm nakim çawa ew berhema wêjeyî ku bi Kurdî tê nivîsandin ji bo Ewropîyan e. Bi rastî tu maneya vê gotinê tune ye.

Her berhemeke wêjeyî berî ku formeke cihanî bigire, divê orijînalîteya xwe ya neteweyî hebe. Bêyî wê yekê tu berhem nikare sinorekê derbas bike, ji ber vê yekê jî min got, ew roman ne mirîna kalekî rind e, mirîna nivîskariyê ye, rind an jî nerind ew ne karê min e.

**Wê bidome**



# Êzîdîti yan yezdanî

## Cotkar

Ev çend car in ku ez xebername-yan li ser ola êzîdî (Zerdeştî) di rojname û kovaran de dixwînim. Lê mixabin her yek li gor kêfa xwe dinivîsîne û tu caran xwe ji bo vî karê giranbuha nawestînin. Min bi gelek dost û hevalan re da û stand, doza nivîsandin û rastkirina qewl û beytên ola êzîdîyan ji wan kir, bersiva wan ev bû: "Heval, em nikarin dolaba dîrokê berevajî bikin. Pêwist e çawa hatibe gotin wisa ji bê nivîsîn".

Mala bavê min xera bibe û bişewite, em di sedsala 20'an de ne û rewşenbîrên me bi vî rengî li dîroka gelê xwe dinivîsîn û şîrove dikin!

Ez rexneyên xwe li wan nakim, lê rastiyeke heye di dîroka her gelî de. Ger ev rastî derket holê û lêkolîn lê nebe, dê çiqas biçe bikeve şevreşiyê, wek çawa welatê me dikin şevreşiya nezaniyê. Di her warî de em bi hev re dibêjin: "Dagirkerên Kurdistanê dîroka gelê Kurd, çanda Kurdan berevajî kirine û kirine malê xwe, klam û stranên me dizîne, her tiştên me kirine yên xwe". Ger ku ev rastiyeke be, dikare bê gotin ku, çanda êzîdîti, orf û adetên wan jî, ji xwe re birine.

## HELWESTÊN ÇEWÊ

Rewşenbîr û zanayên Kurd bi riyên çewt girtine, ji ber van çewtiyan bira ji bira diçixê û gelek tiştên ne baş derdikevin holê. Bi xwe ez nizanim ger mirov bibêje Dimilkî yan Zazakî ne zaraveyekî Kurdî ye, miro li xwe derewan dike? Ger mirov bibêje, dev ji êzîdîtiyê berdin, sê rib (%75) Kurd îslam in, ma wê êzîdî dev ji ola xwe berdin? Ger mirov puf bike wê li ber

**Temenê min niha digihîje 50 salî. Min di tu pirtûkê de peyva "Êzîdîstan" nedîtiye, ji bilî rojnameyên Kurdî. Ev jî ne seyr e, ji ber mirovên zana wek, Muhamed Teymûr, Îbîn Xelkan, Elî Seydo Goranî û gelek miftiyên Kurd xwestine bi van gotinan Kurdên êzîdî ji holê rakin. Di vî warî de gotineke Golda Mayîr tê bîra min, digot: "Ez dizanim kîjan roj be, dê illa serokekî Ereban canfida be û dîlpola be, bi me re têkeve kefte-leftê".**



Ahûra Mazda

bayê tev belav bibin? Oleke ku ji bo namûs û şerefa gelê xwe li ber xwe bide, pêwist e namûs û şerefa gelên din jî biparêze. Çawa ku îslam bû sebebê şkandina namûsa gelek gelan, mixabin îslam jî bi destê gelek kesan hate perçiqandin, yanî namûs û şerefa Kurdên êzîdî hate talankirin, wek çawa ku Tirk, Tat û Faris namûsa Kurdan bi birîn kirin. Ev e sedem ku mirov ji kîjan Kurdê êzîdî bipirse, gelo tu Kurd î? Wê bersiva xwe bide, bibêje: "Ez Kurdekî êzîdî me". Meqseda wî ew e ku, bide zanîn ew ne îslam e. Ez bi gelek Kurdên fileh re peyivîme, gişt dibêjin: "Kurd ne baş in". Bi diti-

na wan êzîdî ne Kurd in

Kê ji êzîdîyan bûyera "Elê Seyê Bêk" nexwendiyê? An bûyera "Ebû El Rûss"? Ên ku keç û bûkên êzîdîyan û şkandina namûsan helal kirin, nexwendine. Dê kî ji wan kuştina serokên Êla Rewandîzê (1119-H) ji bîr bike? Ew bajarê ku Rîstemê Kurdî Zerdeştî li dijî talana îslamê cangorî kir.

Temenê min niha digihîje 50 salî. Min di tu pirtûkê de peyva "Êzîdîstan" nedîtiye, ji bilî rojnameyên Kurdî. Ev jî ne seyr e, ji ber mirovên zana wek, Muhamed Teymûr, Îbîn Xelkan, Elî Seydo Goranî û gelek miftiyên Kurd

xwestine bi van gotinan Kurdên êzîdî ji holê rakin. Di vî warî de gotineke Golda Mayîr tê bîra min, digot: "Ez dizanim kîjan roj be, dê illa serokekî Ereban canfida be û dîlpola be, bi me re têkeve kefte-leftê".

Ez dizanim Kurdistan, Tirkîstan, Afxanîstan, Bilocîstan, Erebaştan û Hindîstan hene, lê di ferhenga Kurdî de min tu caran "Êzîdîstan" nedîtiye û kesî ji min re negotiye.

## ÊZÎDÎTÎ OL E

Êzîdîti ol e, ne welat e, her kesê ku xwe bi êzîdîtiyê reht kiribe, dibêje: "Êzîdîti oleke kevin e". Şêx Hadî dibêje: "Bi hev re bira bin, xwe bikin yek, yekbûna we stûxwariya dijmin û serkeftina we ye". Zerdeşt dibêje: "Dê û bavên xwe biparêzin ta tamarên wan ên kor, li ber wan ranewestin, ew in hêviya bihuştê". Lê ev çî sûd e ku xwendevan û nivîskar, ji bo bîreke taybetî zanistiyê dikin şevreşî.

Êzîdîyan çarşem berdan û îr kirin cejn. Kurdên îslam razî nebûn, Ayet El Kursî kirin stûna ol, dîsa îslam razî nebûn, pesn û senayên Elî Muhamed El Refaî û Ebdul El-Qadir Gêlanî dan, dîsa ji zilm û sîtemên Kurdên îslam nehatin parastin.

Pirr tişt tene ser ziman, lê hêvî ew e ku nivîskarên me bizanibin çawa berxwedana welêt bikin, çawa gel komî ser hev bikin, çawa ronahiyê bixin şûna şevreşiyê. Bi fort û lavan, derew û lehveziyan, xapandin û dubareyan mirov nikare bibêje ku, ev zanistî ye, ilmî ye.


Ger em her dem rastiyeke ji gelê xwe re diyar bikin, tirs û sawa gelê me wê bibe xwedan nav û dê li dijî dijmin bikeve xebatekê û dê bê gotin ku, Kurdistan her azad bibe.

## XAÇEPIRS

### Amadekar: Rasto Zîlanî

**Çeperast:** 1- Şoreşgerekî endamê tevgera Kurtuluş ku piştî 12 îlonê hate dardekirin, di wêne de tê dîtin 2-Îstîsna/ Çêbûyî 3-Nav û deng/ Înfomasyon/ Cînavkê pirranî ji bo kesên yekemîn, ji birrê duyemîn 4-Madeyêke ku jê bombe çêdibe/ Êş/ Şahî, dilxweşî 5- Şexsiyetek ji şoreşa Fransî/ Tiştê ku bi xwe re baranê tîne 6-Tiştên ji holê rabûyî 7-Pê hirî tê ristin 8-Mirîşka biçûk/ Rengdêrekî pirsîyariyê 9-Kurtenivîsa Artêşa Komara Îrlandayê/ Deng, sewt 10-Not/ Cihê bi av

**Serejêr:** 1-Definkirin/ Îrade 2-Fesad/ Çerçîtî 3- Hesinê tekerê erebeyan/ Bajrekî Kurdistanê 4-Kurtenivîsa bijîşk (tixtor)/ Bi Erebi çû (dema borî) 5- Rêxistana ku ji bo serxwebûna Baskê şer dike/ Niha 6-Astengî/ Baneşanek 7-Endam/ dîde (pê tê dîtin) 8- Hasiyat/ Jenggirtî (dema borî) 9-Erdê bi av 10-Notayek/ Bi Dimilkî kî 11- Dara tirî 12-Li hinek deveran bilêvkirina berfê



### BERSIVA XAÇEPIRSA HEFTIYA ÇUYÎ

**Çeperast:** 1-Hatîp Dicle 2-Êvar/ Azot/ Pê 3-Vejandin/ Moz 4-Orîn/ Anîbal 5- Jê/ Îdî/ Îman 6-Azad 7-Agir/ MTA 8-Rohat/ Em 9-Îr/ Dilşa 10-Îrem/ En

**Serjêr:** 1-Hevojkarî 2-Avarê/ Gorî 3-Tajî/ Rih 5-Da/ Tim 6-Dadaîzm 7-Îzînl Ateşe 8-Conî/ Da-man 9-LT/ Bî 10-Man 11-Pola 12-Rêz

## QERTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara ..... pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

**Bedelê abonetiye razînin:**

**Li derve:** Mazhar Günbat

İş Bankası Cağaloğlu Şub. Şube No: 1095

Döviz tevdiat Hesap No: 3138437

**Li Tirkîyê:** Mazhar Günbat

İş Bankası Cağaloğlu Şub. Şube No: 1095

Hesap No: 0408342

Ji kerema xwe re vî cihî dagirin û tevî kopyeke pelê razandina bedelê abonetiye bişînin.

**Navnîşana Welat:** Nuruosmaniye Cad. Atay

Apt. No:5 Daire No:14 Cağaloğlu / İstanbul

Tel: 513 34 33 Fax (Tel): 511 50 07

**Mercên abonetiye:**

	Li hundir	Li derve
3 meh	120.000	50 DM
6 meh	240.000	100 DM
12 meh	480.000	200 DM



# Donzdeh mehên salê

## Çile:


Deşt û çiya bend û  
rez  
Tev dibin berf û terez  
Sobeyên tifik tîn dadan  
Xwe ji sermê biparêz

## Sibat:

Sibehê gerdûn çî xweş  
Navrojê tarî û reş  
Geh berf e geh baran e  
Xwe bide ber soba geş

## Adar:

Adar e meha Newroz  
Sersala Kurdên dilsoz  
Zarokên şox û çeleng



Bihar xweş û rengîn e

Li her der dikin pîroz

## Nîsan:

Vedibin belgên daran  
Rewş dikeve zinaran  
Zarok, karik û berxan  
Berdine beyaran

## Gulan:

Rengê çiçek û gulan  
Beybûn binevş û rihan  
Her sê rengê ala me  
Radixin li ber çavan

## Hezîran:

Germê bi xwe re tîne  
Lewre demsal havîn e  
Çekên tenik li xwe ke  
Ji germê bi hevîne

## Tirmeh:


Li deşt û li zeviyan  
Li bender û li çiyân  
Li qat û gêre dikin  
Mirov weke mûriyan

## Tebax:

Roj sermê de dixele  
Mejî li me dikele  
Li pazdehê vê mehê  
Sersala "şerê gel e"

## Ôlon:

Xweş dibin rez û bostan  
Di çilmisin daristan  
Li hawîr dest pê dike  
Kar û barê zivistan



Payîk honin û biba ye

## Cotmeh:

Jibo jiyane xweser  
Hemû çotkar û karker  
Nîr û halet li milan  
Di xebitin li her der


## Mijdar:

Çi mehek bi rûmet e  
Bi qedir û qîmet e  
Sersala partiya me  
Gelê jê bi minet e

## Kanûn:

Serma û sira bakur  
Ba, bahoz, berf û berxur  
Zarokno li xwe bikin  
Cilên qalind û sitûr

Jîr Dilovan.



Çile pîr berf heyê û sar e



Havîna me zehf germ e

## Zaroktî jî zor e li Kurdistanê

**Şertên jiyana Zarokên  
cengê, yên gelekî ku  
têkoşîna neteweyî dide  
naşibin şertên welatên din.  
Zarokên Kurdistanê jî di  
şertên dijwar de dijîn. Bî  
rastî jî di zaroktî zor e li  
Kurdistanê, lî disa jî zarok  
riyekê dilîzin.**

Nexweşî, tunehî, birçîtî, tazîtî,  
bêperwerdeyî û ji bo zarokekî  
jî tiştê herî girîng mehrûmbû-  
yîna jî lîstikan

Zarokên Kurd dema derdi-  
kevin kuçeyê yan jî di ko-  
lanên Tirkan de derbas dibin,  
an jî di TV' yan de zarokên ku  
di parkan de dilîzin bi hesret li  
li wan mêze dikin ji xwe re

xeyalan çêdikin û wiha  
dibêjin: "Gelo wê rojekê  
parkên me jî yên wiha xweş  
çêbibin ku em tê de bileyîzin,  
wiha kincên nû li xwe bikin,  
herin mektebên xwe, zimanê  
xwe baş hîn bibin û hwd." Xeyal  
dikin. Zarok carina jî, ji  
bo ku qet ne be hinek ji wan  
xeyalên xwe pêk bîne, ji xwe

re lîstikan diafirînin, weke  
kaşkaşoka ku di parkan de  
hene. Zarokên bajarê Ru-  
hayê li taxa Eyûbiyê ku 30  
hezar niştecih lê hene, ji ber  
ku cihê park an jî lîstikê tune  
ye, ji dêla wê ve hêza xwe ya  
afirandêriyê bi kar tînin. Za-  
rokên vê taxê jî bo xwe kaş-  
kaş bikin, çiqas cihên ku he-

ma pal û xwelî be, an li ser  
tenekeyan an jî li ser naylo-  
nan xwe kaşkaş dikin. Za-  
rokên Kurd di van cihên wiha  
de carina dor nabînin ku xwe  
kaşkaş bikin. Bî vî awayî jî  
zarok hinekî be jî, dixwazin  
xeyalên xwe pêk bînin.

Ramazan Ötünç





# Lênêrînek bi lez li ser rojhilatê Kurdistanê

Anîs

Kurdistanê Îranê, an bi gotineke rasttir rojhilatê Kurdistanê ew beş ji axa Kurdistanê digire ber xwe ku li gorî dîtin û texsîma fermî ya Îranê, li van eyaletên jêrîn rûniştine:

1" Azerbeycana Rojava" ji **Mukriyan** û Kurdên Kurmanc ên **Şikak, Irûsî û Celalî**, her wisa ji Azeriyên ku tenê li bajarên **Wirmîye, Xoy, Salmas û Makoyê** dijîn û gundiyan van bajarên bi pirranî Kurmanc in û li Neqedeyê Kurd û Azerî bi hev re dijîn û ji hejmareke kêmtir Asûrî pêk tî.

2" Kurdistan" ku bi **Erde-lan** jî hatiye nasîn.

3 "Kirmaşan" ji Kurdên **Kelhur û Hewramî** û Soran hatiye pê.

4" Loristan" ku zaravayê Lorî diaxivin.

5" Çar Mihal û Bextiyarî" ku bi nijad Kurd in lê, zaravayê wan **Lek û Bextiyarî** ye û bi Farisî re zehf tîkildar bûne.

6" Îlam" ku navenda wî bajarî Îlam e û bi **Lekî û Kelhûrî** qise dikin. Kurdên Eyaleta Kurdistanê, Mukriyan û Kurmanc sînî ne lê Kelhur, Lor û Bextiyarî Şîî ne. Her wiha li bakurê Eyaleta Xurasan ku li bakurê rojhilatê Îranê ketiye, çend bajar hene Kurmancên koçber in -ku di dema hikûmeta Sefewîyan de bi zorê hatibûn koçkirin- û zehfên wan li **Qûçan û Şîrwanê** dijîn û Şîî ne.

Nifûsa Kurdan jî ber ku hîç bilançoyeke resmî heta niha behsa hejmara Kurdan nekiriye, nayê zanîn, lê belê li gorî çavkaniyên nefermî: di navbera hejmarên 4,5 - 8 milyonî de tê behskirin. Mezintirîn û bi nav û dengtirîn bajarên rojhilatê Kurdistanê ev in: **Kirmaşan, Sine (Senedec), Mehabad (Sablaş), Seqiz, Bane, Merîwan, Bokan, Şîno, Serdeşt, Pîranşar (Xanê), Bîcar, Qurwe, Xurmiwa (Xurrem Abad), Pawe, Newsûd, Ciwanro, Qesrî Şîrîn, Serpêlî Zehaw** û...

Di şerê 8 salan de çend bajarên rojhilatê Kurdistanê bi carekê hatin kavilkirin, ji bo minak bajarê Qesrî Şîrîn bi erdê re dîz bû û gelek bajarên jî ziyar ji şer dîtin.

Rojhilatê Kurdistanê der barê kanên mehdenê ve pirr dewlemend e û beşeke zehf jî

xwedanî neftê (petrolê) ye. Niha neftên bajarên **Kirmaşan, Neftşar û Şahabadê** jî Kurdistanê diçin der û pareke ber biçav a neftê ya giştî Îranê dabîn (temîn) dikin. Her wiha kanzayên çur be çur ên Kurdistanê di Îran û cihanê de bi nav û deng in.

Kurdistan di warê aborî de zehf qels û kêmtir dahat e û bi belangaztirîn ji herêmên Îranê tê jimartin. Ajeldarî (heywan xwedîkirin), kîşt û kal (zireet) û karên reş û bi xetere hîn zehf-

dim û şerê **Emîrxanê Lepzêrîn** li dijî Sefewîyan, şerê **Smaîl Axayê Şikak** (Simko), her wiha **Heme Reşîd Xanê Bane** jî bîr naçe û parçeyên ji dîroka me Kurdan in.

Cara yekemîn komara Kurdî bi serokatiya pêşewayê şehîd **Qazî Muhemmed** di 1946'an de li **Mehabadê** hate damezirandin ku temenekî kurt hebû û her çiqas jî qels û kêmasiya wê hebû, lê roleke pirr baş bi zindîhiştina giyana

ên Kurd di nav herduyan de xebat dikirin: Şehîd **Hesen Qizilcî, Azîz Yusifî, Alî Gelawêj, Mihemmed Emin Şêx-ul Îslamî Mukrî (Hêmin), Kerîm Hisamî, Xenî Bilûryan, Rehîm Seyfî Qazî** û...

Piştî serkutkirina partiyan Kurd û ne Kurd di salên peşî ya "Şoreşa Îslamî" de, Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê jî gelek guherînên siyasî bi ser ve hatiye:

Di destpêka şerê çekdariya

Tehranê red kirin. Niha xebata çekdariyê ya wan ku bi navê "Lader" jî tên nasîn ji ya PDK-Îranê zêdetir e.

Çaxê serketina "Şoreşa Îslamî" grûbeke maoîst jî bi navê "Komele" bi serokatiya **Selaheddîn Mohtedi** û tevî meleyekî sor bi navê **Şêx Îzzeddîn Huseynî**, di Kurdistanê de xuya bû ku xebata çekdarî dikirin lê piştî çend salan belav bûn û li ba çend grûbên din î Kurd û ne Kurd, partiyek damezirandin bi navê "**Komunistê Îranê**" ku ew jî maoîst bûn. Çend rêxistinên çepî yên Îranê jî bingeha xwe di Kurdistanê de çekiribûn ku an çûn nav Partiya Komunist an Tûdehê an jî ji hev belav bûn.

Di destpêka şoreşa 1978'an a Îranê de bizaveke Kurdî (sûnî) li bajarên Eyaleta Kurdistanê û nemaze li bajarê Sineyê bi rêberiya **Ehmed Muftîzade** hate çekirin û dewleta Îranê li hemberî Şêx Îzzeddîn ew danî û aligiriya wê kir. Lê di pey xebata Muftîzade ya li dijî desthilatxwaziya meleyên Şîî, hate girtin û di havîna 1993'yan de -mehek berî ku bimire- hate azadkirin. Çend rêxistinên olî yên biçûk jî hebûn ku aligirên Şah bûn lê em nikarin tevan di lîênêrîneke wisa bi lez de bidine naskirin.

Niha xebata siyasî di Kurdistanê de bi celebê çekdarî, siyasiya veşartî tê kirin, lê piştî reşekujîya ku rejîm li dijî serokên partiyan Kurd -bi taybetî Dr. Ebdurrehman Qasimlû (13/7/1989) û Dr. Sadiq Şerefkendî (22/9/1992)- kir pirr qels bûn û hêzeke kêmtir bi wan ve hiştiye.


Îro ew bîr û bawerî di nav mejiyên çend partiyan siyasî û beşeke pirr ji ciwanên ronakbîr ên Kurd de çêbûye ku dibêjin: "Dirûsmeya xudmurtarî (otonomî) dirûsmeyeke kevin e û dem di ser re bihuriye." Li ser vê hizrê partiyekê nû bi navê, "**Partiy Serbi-xoyî Kurdistan**" bi serokatiya **Emîr Qazî** -Kurdê Rojhilat- li derveyî welêt hatiye damezirandin ku bi dirûsmeya Kurdistanê mezî dilve.



Qazî Muhemmed



Abdurrahman Qasimlû



Li Bajarê Mehabadê komara Kurdistan ya yekemîn hafîbû damezrandin

tirîn cure karê xelk in ji bo jîyanê. Hîç fabrikeyên mezin ên pîşeyî (meslekî) li Kurdistanê nîn e ku bikaribin ciwanên bêkarên Kurd bi şîxul bikin. Krîza aborî jî, roj bi roj bêtir qirîkên xelkên zehmetkêş û hejarên Kurd dişidîne û ev tiştê hanê kovaneke mezin ku ji bo meaşên rojane ya malbatê, mirov mecbûr dike ku, ji bo bîdestxistina gepek nan her dem mijûlî rake rake be.

Xebata Kurdîti li rojhilatê Kurdistanê xwedî mîjûyeke dirêj e û bûyerên **Kela Dim-**

Kurdîti li tev parçeyên Kurdistanê kiriye.

Piştî rûxîna Komara Mehabadê, xebatên Kurdan bêtir di nav **Partiya Demokratê Kurdistanê Îranê û Hizba Tûdeh a Îranê** de hate kirin, lê Tûdeh mîna partiyekê komunist xebat dikir û di çarçoveya Îranê de mafê diyarkirina çarenûsa hindêkahî di welêt de, li ber çav girtibû. Nêzikatiya van du partiyan heta ew salên paşî bandoreke pirr mezin li ser hev danîbûn û beşeke ber bi çav ji ronakbîrên mezin

Kurdistanê de di Kongreya Çaran a partiye de, parçeyek kêmtir ji endamên Komîteya Navendî bi serokatiya Xenî Bilûryan ku komunist bû, li dijî serokatiya **Ebdurrehman Qasimlû** partiyek pêk anîn ku bi navê **Hizba Demokrat a Kurdistanê ya Îranê** (Aligirên Kongreya Çarê) xwe dan nasîn. Piştî çend sal beşeke din jî, ji "**Rêberî**" yê bi serokatiya **Celîl Gadanî** jî partiye derketin û tîkiliya Qasimlû ya bi Iraq û Rojava re û biryara hevpeyvîna di gel rejîma

welat

- Li ser navê ÎMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adina) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar
- Berpirsiyarê Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat
- Navnîşan (Adres) Nuruosmaniye Cad. Atay Apt. No:5 Daire No:14 Cağaloğlu / İstanbul • Tel: 513 34 33 Tel (fax) 511 50 07
- Berpirsiyariya Ewropa • Postfach: 1531, 53117 Bonn 1, Germany • Tel: (49) 228-630990 (Navbera saet 11.00-16.00)
- Fax: (49) 228-630715
- Çapkirin (Baskı) Yeni Asya Matbaacılık • Belavkirin (Dağıtım) Birleşik Basın Dağıtım AŞ.